

Karak, M.Z. (2021). Bandora Fuzûlî ya li ser Pertew Begê Hekkarî: Mînaka 'Her Nebîta ya Rab, The Journal of Mesopotamian Studies, 6 (1), 97-127 DOI: 10.35859/jms.2021.829141.

MAKALE BİLGİSİ/ARTICLE INFO

Article Type/Makale Türü: Research Article /
Araştırma Makalesi
Received / Makale Geliş Tarihi: 20.11.2020
Accepted / Makale Kabul Tarihi: 21.02.2021
Doi: 10.35859/jms.2021.829141

BANDORA FUZÛLÎ LI SER PERTEW BEGÊ HEKKARÎ: MÎNAKA XEZELA "HER NEBIT YA REB"

M. Zana KARAK

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü ABD Yüksek Lisans Öğrencisi, m.zana47@gmail.com, <https://orcid.org/0000-0003-1681-4917>.

KURTE

Di edebîyata klasîk a Îslamî de wergerên menzûm jî parçeyek ji kevneşopîya çanda edebîyatê ne. Gava em bala xwe didin edebîyata Kurdî ya klasîk em dibînin ku di vê edebîyatê de jî ev kevneşopî heye. Di vê xebatê de di çarçoveya edebîyata berawirdî de li ser mijarê hatiye rawestan û bi vî awayî analîz û nirxandin hatine kirin. Di vê xebatê de li ser xezela ku paşerwaya wê "Her Nebit Ya Reb" e û di dîwana Pertew Begê Hekkarî de cî girtiye, bi berfirehî hatiye sekinandin. Xezel ji heft malikan pêk tê û bi eslê xwe ne ji aliyê Pertew, lê ji aliyê Fuzûlî û bi Azerîkî hatiye nivîsîn. Ya ku Pertew li vir kiriye ne şerh e ne jî nezîre ye. Ji ber ku ev wergereke wê ya Kurdîya Kurmancî bû, me ew ji întîhalê nehesiband û di çarçoveya kevneşopîyê de me ew weke wergereke edebî nirxand. Pertew di wergera vê xezelê de heta ji dest hatiye jî metnê re sadiq maye û nebûye sedema tehrîfata xezelê. Ev xezel mîna ya resen (ya Azerî) wergerandiye Kurdîya Kurmancî û

ji ber ku ji hêla serwa, paşserwa û kêşa erûzê mîna ya resen e, wergerek şareza û hunerane derketiye holê. Di edebîyatên klasîk de helbestkaran ji bo hunermendîya xwe nîşan bidin mînakên bi vî rengî dane. Pertew jî ji bo hunermendîya xwe bide xuyakirin; ev xezel bi awayekî xweş, bi uslûbeke hunerî ew kiriye malê Kurdîya Kurmancî jî. Di vê xebatê de ev xezel ji aliyê rûxsarî û naverokê ve hatiye berawirdkirin û xezel ji hêla întihal, şerh, nazîre û ji hêla werger, huner û uslûbê ve hatiye analîzkirin. Di encamê de jî bandora Fuzûlî ya li ser Pertew li ber çavan hatiye raxistin.

Peyvên Sereke: Fuzûlî, Pertew Beg, Xezel, Edebîyata Klasîk, Edebîyata berawirdî, Întihal, Werger, Kevneşopî

Fuzûlî'nin Pertew Begê Hekkarî Üzerindeki Etkisi: "Olmasun Yâ Rab" Redifli Gazeli Örneği

ÖZ

Klasik İslami edebiyatta manzum eserlerin çevirisi edebiyat kültürünün bir parçasıdır. Klasik Kürt edebiyatına baktığımız zaman bu kültürün bu edebiyatta da var olduğunu görürüz. Bu çalışmada, Klasik Kürt edebiyatında var olan manzum eserlerin çevirisinin bir örneği incelenecektir. Çalışmada, Pertew Begê Hekkarî'nin divanında yer alan ve manzum eserlerin çevirisine bir örnek teşkil eden "Her Nebit Ya Reb" (Olmasun Ya Reb) redifli gazeli üzerinde etraflıca durulmuştur. Söz konusu gazel yedi beyitten meydana gelmektedir. Aslı Pertew tarafından değil de Fuzûlî tarafından Azeri lehçesiyle kaleme alınmıştır. Pertew'in burda yaptığı ne şerh, ne de naziredir. Pertew'in bu eseri Kürtçe'nin Kurmancî lehçesiyle gazelin bir çevirisi olduğu için bu eseri intihalden saymadık ve klasik edebiyat kültürü çerçevesindeki edebi bir çeviri olarak değerlendirdik. Pertew bu gazelin çevirisinde elden geldiğince metne sadık kalmıştır ve gazelin tahribatına sebebiyet vermemiştir. Bu gazeli, orijinali olan Azericesi gibi Kürtçe'nin Kurmancî lehçesine çevirmiştir. Kafiye, redif ve aruz vezni orijinali gibi uygulamış, sanatlı ve başarılı bir çeviri ortaya çıkmıştır. Klasik Kürt Edebiyatı'nda şairler hünerlerini göstermek amacıyla bu tip örnekler vermişlerdir. Pertew de hünerini göstermek için bu gazeli güzel bir şekilde, hünerli bir üslupla Kürtçe'nin Kurmancî lehçesine mal etmiştir. Bu çalışmada her iki gazel içerik ve biçim yönünden kıyaslanmıştır ve gazelin intihal, şerh, nazire, çeviri, sanat ve üslup yönünden de analizi yapılmıştır. Sonuç olarak da Fuzûlî'nin Pertew üzerindeki tesiri gözler önüne serilmiştir.

Anahtar Kelimeler: Fuzûlî, Pertew Beg, Klasik edebiyat, Karşılaştırmalı edebiyat, İntihal, Çeviri, Gelenek

The Effect of Fuzûlî on Pertew Begê Hekkarî: "Her Nebit Ya Reb" Redif Ghazal as Sample

ABSTRACT

Translation of verse works in classical Islamic literature is a part of literary culture. When we look at the classical Kurdish literature, we see that Kurdish literature has this culture too. In this study, an example of the translation of verse works in Classical Kurdish literature will be analyzed. In the study, the redif ghazal "Her Nebit Ya Reb" (Olmasin Ya Reb), which is an example of the translation of verse works and is included in the collected poems of Pertew Begê Hekkarî, has been elaborated. The redif ghazal in question consists of seven couplets. The original of this work was written not by Pertew but

by Fuzûlî in the Azeri Turkish dialect. What Pertew does here is neither annotation nor a nazire. Since this work of Pertew is a translation of ghazal in the Kurmanji dialect of Kurdish, we did not count this work as plagiarism and evaluated it as a literary translation within the framework of classical literary culture. In the translation of this ghazal, Pertew remained faithful to the text as best he could and did not cause the destruction of the ghazal. This ghazal has translated into the Kurmanji dialect of Kurdish like its original Azerbaijan Turkish. He applied rhyme, redif and prosody meter as the original, an artistic and successful translation has emerged. Poets in Classical Kurdish Literature gave such examples in order to show their skills. Pertew also appropriated this ghazal to the Kurmanji dialect of Kurdish with a skillful style to show his skill. In this study, both ghazals were compared in terms of content and form, and the ghazal was analyzed in terms of plagiarism, annotation, nazire, translation, art and style. As a result, the influence of Fuzûlî on Pertew was revealed.

Keywords: Pertew-Fuzûlî, Classical literature, Comparative literature, Plagiarism, Translation, Tradition.

Extended Summary

Nations and societies in the Middle East have been in contact and exchanged with each other since ancient times. Kurds have also had relations with Persians, Arabs, Turks and Armenians throughout history. This dealing has been in the field of culture, literature and language as well as in the field of trade, and this dealing even continues today. Many examples of this relationship can be seen when we take a glance at Kurdish and Turkish literature. Especially in classical literature, these examples are more common in verse texts.

Translation of verse works in classical Islamic literature is a part of literary culture. When we look at classical Kurdish literature, we see that this culture is also present in this literature. In this article, an example of the translation of verse works in Classical Kurdish literature will be examined. In the study, the odes (Ghazals) of Fuzûlî's (d. 1556.) "olmasun ya Rab" and Pertew Begê Hekkarî's (d. 1834?) "her nebit ya Reb" odes with redif (repeated voice) were discussed in detail. The ode in question consists of seven couplets. Although the Kurdish translation of this ode is included in Pertew's Diwan, the Azerbaijani version of the same ode is also included in Fuzûlî's Turkish Diwan. The original was written not by Pertew but by Fuzûlî in the Azeri dialect.

Since it is a translation of Fuzûlî's ode with the Kurmanji dialect of Kurdish, we considered Pertew's ode as a literary translation within the scope of classical literary culture. In the translation of this ode, Pertew remained faithful to the text as best he could and did not cause the deterioration of the ode. Pertew translated this lyrical and sufi ode with the same rhyme, redif and aruz wezni as the original, resulting in an artistic and successful translation.

In Classical Kurdish Literature, poets gave such examples in order to show their skills. Pertew also produced this in Kurmanji dialect of Kurdish with a beautiful and dexterous style to show his skill.

These odes were compared within the comparative literature discipline, and then the comparison mechanism was applied to them. Literary and cultural exchanges between the two languages are va-

luable as a brilliant for the relationship dimension of societies. When we look at the ghazals of Fuzûlî and Pertew, it will be seen that these odes were written in two different languages, periods and places, or that Pertew translated this ghazal into Kurmanji dialect of Kurdish. One might as well say, this ode is an important example in terms of the relationship between Turkish and Kurdish literature. This, in turn, imposes on us the concentration of this ode and its translation within the discipline of Comp-Lit science. This ode translated by Pertew may be the first translation from Azerbaijani into Kurmanji dialect of Kurdish, and according to the available data, our opinion is in the same direction. In this context, this study shows us a little bit the relations between Turkish and Kurdish literatures in the Ottoman period.

The comparison of the two odes in the article was made in terms of both their authors and their content and form features. In the study, biographies of both poets were presented briefly and the international transcription letters and critical edition of the ode texts were made and given. The comparative method of manuscript copies was used in the preparation of the critical text. In this context, the similarities and differences between the two odes were determined and evaluated. Likewise, within the scope of the classical literature tradition, this ode was evaluated in terms of parallel and plagiarism. As a method, the text of the two odes were adhered to comparison in terms of shape and content. What did Pertew do here, what was his purpose? Was it parallel, translation or plagiarism? In this study, such questions were deepened and their answers were sought.

This ode obviously shows Fuzûlî's influence on Pertew. In any case, if there is a poet's willingness and effort to translate an ode, this is also a sign that the translator is directly affected. If Fuzûlî had not had an influence on Pertew and Pertew had not liked his ode, he would not have translated it into Kurmanji. This translation also informs us of something else, which is that Pertew was also aware of poets and literary texts before him and followed neighbor literatures. Likewise, we understand from the translation that Pertew also knows Turkish. Therefore, this translation reveals an example of the relationship between Turkish and Kurdish literatures and shows that this relationship was also present in the period of Kurdish principalities. Besides, we know that a work placed in Kurdish princes' libraries is Fuzûlî's Turkish Diwan.

Briefly, in this study, both odes were compared in terms of content and form, and the ode was analyzed in terms of plagiarism, annotation, parallel, translation, art and style. As a result, the influence of Fuzûlî on Pertew was revealed.

Destpêk

Li Rojhilata Navîn ji herêma Îranê bigirin heta bi Efxenistan û Erebiştana Siûdî; ji Kurdistanê bigirin heta bi Azerbeycan û mintiqeyên derûdora van herêmanên navborî hemû netew û civak di nava têkilî û danûstandinê de ne. Ev têkilî û danûstandin bi qasî ku di bazirganîyê de heye ew qasî jî di mijarên çand, edebîyat û ziman de jî pêk hatiye û hîn jî ev têkilî dewam dikin. Herweha di dîrokê de têkilîyên gelê Kurd jî bi yê Faris, Erebi, Tirk, Ermenî û yê dinê re çê bûne û di qada edebîyat, çand û ziman de danûstandin kirine. Abdurrahman Adak derbarê edebîyat û têkilîya Kurd û Tirkan de weha dibêje:

“Di binemaya xwe de edebîyata Kurdî ya klasîk, ji edebîyata Tirkî zêdetir bi edebîyatên Farisî û Erebi re têkildar e. Lewra ji aliyekî ve Kurd berî ku rastî Tirkan werin, rastî Faris û Ereban hatine, ji aliyê di ve jî çavkanîyên hizrî yên edebîyata klasîk ji hinterlanda Farrisî û Erebi derbasî Kurdî û Tirkî bûne. Lêbelê digel vê jî di navbera edebîyatên Kurdî û Tirkî yên klasîk de jî têkilîyeke girîng çêbûye. Piştî ku di serdema tarîxî de Kurd û Tirk rastî hev hatine û piştê jî wekî du cîranan bi hev re dest bi jîyaneke nû kirine, di navbera edebîyatên wan de jî bi awayekî jêneger têkilî û danûstandinek çêbûye. Herçiqas têkilîya edebîyata Kurdî bi edebîyata Tirkî re, ji têkilîya wê ya bi edebîyatên Erebi û Farrisî re derengtir dest pê kiriye jî, lêbelê dîsa jî têkilîya di navbera wan de ji texmînê zêdetir dewlemend û balkêş e, loma jî hêjayî lêkolînê ye (Adak, 2015:75-110).

Em gava li edebîyata Kurdî û Tirkî dinihêrin em gelek nimûneyên vê têkilî û danûstandinê dibînin. Bi taybetî di qada edebîyata klasîk de di metnên menzûm de ev nimûne zêdetir xuya dibin.

Dîsa li gorî Adak qonaxa yekem a serdema pêşveçûna danûstandinên edebîyata Kurdî û Tirkî ji dawîya sedsala XVIIem dest pê dike û heta bi dawîlêhatina mîrektîyên Kurdan ku beramberî nîvê sedsala XIXem tê, dewam dike. Kesê ku ev serdem daye destpêkirin di dawîya sedsala XVIIem de Ehmedê Xanî ye. Weke tê zanîn di edebîyata Tirkî de gelek wergerên Mem û Zîna Ehmedê Xanî hene ku ev jî yek ji nîşaneyên danûstandina di navbera edebîyata Tirkî û Kurdî de ye (Adak, 2015:75-110). Em di nav sînore dewleta Osmanî de rastî wergerên Tirkî yên ji Soranî û Goranî jî tên. Keyfî di sala 1881an de xezeleke Kurdî¹ û manzûmeyeke Kurdiyî Goranî² ku di wê demê de dibêje 300 sal berê hatiye nivîsîn tevî wergerên wan ên Tirkî di rojnameya *Tercümanê Heqîqet (Tercüman-i Hakikat)* de weşandiye (Veroj, 2017:113-120). Ev nimûneyên wergerên pexşan ku ji Soranî û Goranî (Hewramî) ne, ew jî nîşan didin ku ev danûstandinên di navbera edebîyata Tirkî û Kurdîya Kurmancî de hatine kirin ji bo zaraveyên din jî pêk hatiye. Herweha em dizanin ku di pirtûkxaneyên mîrektîya Bedlîsê de dîwanên Farrisî û Tirkî yên helbestkarên meşhûr ên weke Camî, Hafîz, Sa‘dî, Baqî û Nefî jî hebûne (Çelebî, 1965:1276). Ev yek jî dîsa derbarê têkilîya edebîyata Kurdî û Tirkî de fikrekê dide me û îhtîmal e ku di mîrektîya Hekkarî de dîwana Fuzûlî jî di nav de gelek berhemên ji edebîyata cîranan hebin.

Dema Dîwana Pertew li Bakur bi tîpên latînî hatiye çapkirin (Bnr. Doskî, 2011:211) û ev xezela bi redîfa “Her Nebit Ya Reb³” ji aliyê me ve hat xwendin û pêve bi me re şik û gumanek çê bû. Lewra ev xezel ji me re xerîb nedihat. Ev ritm, melodî û kêşa xezelê ji guhan re û serwa û paşserwayê wê jî ji çavan re naskirî bûn. Dema em li ser kûr bûn hat bîra me ku di dîwana Fuzûlî (1480-1556) de xezeleke weha heye. Piştî vê gumanê, îhtîmala ku ev xezel ne ya Pertew be û ev ya Fuzûlî be, derket pêş. Gava

- 1 Li gorî tesbîtên me; Kurdî mexlesa Mistefa Begê Kurdiyê Sahîbqîran (1809-1850) e. Ji bo helbest û wergera wê ya bi Tirkî bnr. Keyfî, Gazel, *Tercüman-i Hakikat*, no 969, r. 2, 18 Şevval 1298 (13ê îlona 1881ê). Herweha di navbera teksta rojnameya T.H’ê û nusxeya Dîwana Kurdî de jî hem ferqên biçûk hene hem jî teqdim û texîr di navbera malikan de çê bûne, di rojnameya de 8 malik hene lê di Dîwana Kurdî de 9 malik hene (bnr. Kurdî, 2010:124).
- 2 Li gorî tesbîtên me; Ev helbesteke Mewlewîyê Kurd (Abdurrahîm Mewlewî/1806-1882) e û bi Hewramî ye. Ji bo helbestê û wergera wê ya bi Tirkî bnr. Keyfî, Cevabnamî Manzûm, *Tercüman-i Hakikat*, no 974, r. 3, 25 Şevval 1298 (19ê îlona 1881ê). Herweha di navbera teksta rojnameya T.H’ê û nusxeya Dîwana Mewlewî de jî hem ferqên biçûk hene hem jî di navbera malikên wê de teqdim û texîr çê bûne, di rojnameya de 23 malik hene lê di Dîwana Mewlewî de 26 malik hene (bnr. Mewlewî, 1966:110-116). Keyfî ji bo vê helbestê dibêje teqriben 300 salî ye, lêbelê jiyana Mewlewî di sedsala 19em de borîye.
- 3 Ji vir û pêve ji bo hêsantir û kurttir e, em ê vê xezelê weke xezela “Ya Reb”ê bi nav bikin.

ku me xezelên Fuzûlî kontrol kirin û pêve ev îdia hat piştrastkirin ku xezel ya Fuzûlî ye. Heta niha li ser helbestên Pertew hin xebat hatine kirin⁴, lêbelê tesbîta vê xezela ew qas meşhûr nehatibû kirin û ev yek jî mirovan matmayî dihêle. Bi heman awayî dîsa xezeleke Fuzûlî ji aliyê helbestkarê Kurd Fehmî Begê Pêçarî (Namî) ve jî ji bo Kurdiya Kurmancî hatiye wergerandin û texmîskirin (Demir, 2019:54).

Di serî de Pertew Begê Hekkarî û Fehmî Begê Pêçarî tê de divê li ser helbestên helbestkarên dinê jî lêkolînên bi vî rengî bînin kirin û tîkiliya edebiyata Kurdî bi edebiyatên cîranan re were tesbîtîkirin.

Di vê xebatê de xezela bi paşserwaya "olmasun ya Rab" a Fuzûlî û "her nebit ya Reb" a Pertew Begê Hekkarî dê di nav disîplîna edebiyata berawirdî de bînin berawirdkirin û mekanîzmaya berawirdkirinê dê bê îcrakirin. Danûstandinên çandî û edebî ku di navbera du zimanên cuda de pêk tînin, gelekî bi nirx in. Dema em li xezela Fuzûlî û Pertew dinihêrin, tê dîtîn ku ev xezel hem bi du zimanên cuda hem jî di du serdem û li du cihên cuda hatine nivîsîn ango Pertew ew wergerandiye Kurmancî. Ev jî dike ku em di nav disîplîna zanista edebiyata berawirdî de li vê xezelê û wergera wê binihêrin û li ser mijarê rawestînin. Dibe ku ev xezela ku Pertew wergerandiye, wergera yekem be ku ji Azerî ji bo Kurmancî hatibe kirin û li gorî daneyên ber dest qenaeta me jî bi vî aliyê ve ye. Herweha ji bo tîkiliya di navbera edebiyata Kurdî û Tirkî de jî ev xezel nimûne û mijareke girîng e. Di vê çarçoveyê de ev gotar tîkiliya di navbera edebiyata Kurdî û Tirkî ya di serdema Osmanî de jî hinekî nîşanî me dide.

Ji ber ku berawirdkirina her du xezelan dê li ser metnên wan bê kirin, weşandina metnên wan jî dê bibe beşeke girîng a vê gotarê. Metnên xezelan dê bi awayekî transkîrîbekirî û rexneyî (edîsyon-kîrîk) bînin weşandin. Di amadekirina metnên rexneyî de, dê rêbaza berawirdkirina nusxeyên destxet were bikaranîn û ferqên di navbera nusxeyan de jî dê di jêrenotan de bînin nîşandan. Em dê xezela Fuzûlî ji destxetan li gorî herfên transkîrîpsiyonê ya navnetewî ku di elîfbêya Tirkî ya latînî de tînin bikaranîn tercîh bikin. Lewra ev xezel bi Tirkiya Azerî ye û me ji bo latînzekirinê ev rêbaz tercîh kir da ku hev-sengîyek bi ziman re hebe û baş were tîgîhiştin. Ji bo transkîrîbekirina metna xezela Pertew jî ku em wê weke wergera xezela Fuzûlî dinirxînin em dê dîsa bi herfên transkîrîpsiyonê yê navneteweyî ku di metnên Kurdî de tînin bikaranîn nîşan bidin. Yanî em ê formên wan ên ku di elîfbêya Kurdî ya latînî de tînin bikaranîn tercîh bikin. Herfên bi Erebi û yê muqabilê wan ku di transkîrîpsiyonê de me bi kar anîne ev in:

Elîfbêya Transkîrîpsiyonê ya Navneteweyî					
Tîpên Erebi	Tirkîya Osmanî	Kurdî	Tîpên Erebi	Tirkîya Osmanî	Kurdî
ا (إ)	a, ā	a	ض	đ/z	đ/z
ا (أ)	a, e, i, u, ü	e	ط	ţ	ţ
ب	b, p	b	ظ	z	z
پ	p	p	ع	‘	‘
ت	t	t	غ	ğ	ğ/x
ث	s	s	ف	f	f
ج	c, ç	c	ف		v
چ	ç	ç	ق	q	q

4 Bnr. Kurdo, 1992; Doskî, 2006; Amêdî, 1978 (Herweha latînzekirina van her du berheman; Sadînî & Guzereşî, 2011; Zinar, 1991).

ح	h	ḥ	ك	k, g, (ñ)	k
خ	ḫ	x	گ / گ	ñ	g/k
د	d	d	ل	l	l
ذ	z, ḏ	z	م	m	m
ر	r	r	ن	n	n
ز	z	z	و	v, u, ū, ü, o, ö	w, û, o
ژ	j	j	ه	h, a, e	h, e
س	s	s	ال	la, lā	la
ش	ş	ş	ى	y, ı, î, î, î	y, î, ê
ص	ş	ş	ء	'	'
		'	Apostrof (Dabir)	'	'

Di amadekirina metnê herdu xezelan de jî tenê nusxeyên destxet ku di pêvekan de cî digirin esas hatine girtin. Me ji bo xezela Fuzûlî tenê çar nusxeyên destxet ên cuda di amadekirina metna rexneyî de bi kar anîn. Di nav van nusxeyan de me nusxeya ku di 1672yan de li Bexdayê ji aliyê Qudbeddîn el Kirmanî ve hatiye îstînsaxkirin weke bingeh qebûl kir û dîsa me nusxeyên din jî pê re muqayese kir û cudahiyên wan di aparatan (jêrenot) de nîşan dan. Me ji bo wergera xezelê ya Kurdî jî dîsa tenê nusxeya destxeta Dîwana Pertew a ku ji aliyê Kemal Badıllı ve hatiye îstînsaxkirin esas wergirt. Kêmasiyên vê nusxeyê jî dîsa me di nav kevaneka çargoşe û jêrenotan de nîşan da û bi vî awayî me metneke rexneyî derxist holê.

Di vê xebatê de me li ser metnên resen berawirdkirina xwe kiriye. Ji ber ku Pertew xezela Fuzûlî rasterast wergerandiye Kurdî me hewce nedît careke dinê vê xezelê wergerînin Kurdî. Di gotarê de berawirdkirina herdu metnên xezelan dê ji aliyê helbestkarên wan û taybetiyên ruxsarî û naverokî yên xezelan ve bê kirin. Di çarçoveya van qadan de wekhevî û cudahiyên wan, tiştên ku wergir (Pertew) ji şander (Fuzûlî) kopî kirine û aliyên wî yên orjînal ku hebin dê bîn tesbîtkirin û nirxandin. Em dê di vê çarçoveyê de li ser mijara întîhal û nezîreyê jî rawestin, lewra ev mijar divê di çarçoveya kevneşopîyê de were nirxandin. Herweha berîya em derbasî van mijarên navborî bibin em ê kurteagahiyekê derbarê jîyana herdu helbestaran jî pêşkêş bikin.

Weke rê û rêbaz di berawirdkirina ruxsarî û naverokî de, em dê bi metnên herdu xezelan ve girêdayî bimînin. Em dê bi awayekî muqayese li ser aliyên ruxsarî û naverokî yên xezelan bisekinin. Gelo Pertew Begê Hekkarî li vir çî kiriye, mebesta wî çî ye? Gelo ev tiştê ku li vir kiriye nezîre ye, werger e an întîhal e? Di vê çarçoveyê de em ê li bersivên van pirsan jî bigerin. Lêbelê berîya vê yekê em dê pêşî danasîna van terman bi kurtasî bikin û paşê jî dê li ser wan analiz û nirxandin bikin û encamekê jê derxînin. Di encamê de jî hevbeşî û cudahiyên xezelan, ast û rêjeya danûstandinê û bandora Fuzûlî ya li ser Pertew Begê Hekkarî û asta orjînalîteya wergera Pertew dê bîn nirxandin û di vê çarçoveyê de dê hin tesbîtan bêne kirin.

1. DERBARÊ JÎYANA FUZÛLÎ Û PERTEW BEG DE KURTEAGAHÎYEK

Derbarê herdu helbestkaran de ji ber ku bi hêsanî agahîyên zêdetir dikarin bên bidestxistin, me pêwîstî bi parvekirina agahîyên zêdetir nedît.

1.1. Fuzûlî (1480?-1556)

Di çavkanîyên derbarê Fuzûlî de tê ragihandin ku navê wî yê esil Mehmed e û yê bavê wî jî Süleyman e (Karahana, 1989; Mengi, 2016; Tarlan, 2013; İpekten, 2013). Li gorî texmînan, Fuzûlî di sala 1480yî de li herêma Iraqê hatiye dinê û di sala 1556an de ji ber şewbekê li derdora Bexdayê wefat kiriye (Kanak, 2015:1).

Li gorî agahîyên ku Haluk İpekten radigihîne; Fuzûlî di berhemên xwe de, di pêşgotina *Hedîqetu's-Sû'edayê* û *Dîwana* Farisî de gotiye zimanê min yê zikmakî Tirkî ye. Lêbelê derbarê Fuzûlî de agahîyên ku tên zanîn pir kêmtir in û cih û dîroka jidayikbûna wî jî bi awayekî zelal ne diyar e (İpekten, 2013:24). Lê tiştê ku bi piranî tê zanîn ev e ku Fuzûlî li Iraqê hatiye dinê, li wê derê jîyana xwe bo-randiye, di warê edebîyatê de pir serkeftî ye, gelek zimanan dizane û zêde berhemdar e. Abdülkadir Karahan jî di berhema xwe de dest nîşan dike ku hin kes ji Fuzûlî re dibêjin Kurd û hin jî dibêjin Faris e. Lêbelê Karahan li dijî van îdiayan derdikeve û dibêje wesîqeyeke ku van îdiayan piştrast bike di destên me de tune ye û Karahan, Fuzûlî weke Tirk qebûl dike (Karahana, 1989:114-115).

Ahmet Emin Saraç di teza xwe de Fuzûlî Kurd qebûl nake û derbarê qewmîyeta Fuzûlî de dibêje: "Yek ji pisporên herî mezin ê edebîyata Îranê, Sa'îd Nefîsî di tezkîreya şairan de ku zêdetir ev weke tarîxa edebîyatê ye, gotiye Fuzûlî Kurd e. Lêbelê haya Nefîsî ji dîwana Farisî ya Fuzûlî tune ye û berhemên wî jî baş nas nake" (Saraç, 2018:15). Baba Merdoxê Rûhanî jî di *Dîroka Navdarên Kurd* de radigihîne ku Fuzûlî Mihemedê kurê Silêman e û ji Kurdên Azerbeycanê ye (Rûhanî, 2017:178).

Îdiayên ku Fuzûlî Kurdî dizane an jî Kurd e ji aliyê hin nivîskar û lêkolanan ve gelek caran hatiye ser ziman. Di nav wan kesan de nivîskar Ahmet Turan Alkan û nivîskar Seîd Verroj jî hene. Alkan di nivîsa xwe ya bi navê "Mimar Sinan'ın Ermeniliğine Dair" de dibêje: "Dostekî min ê entellektuel ku ehlê medreseyê bû xezelên Fuzûlî yên Kurdî jî jiber dixwendin û ji bo Fuzûlî digot; matmayî nebin, hûn jî dizanin ku rehmetî Kurd bû" (Alkan, 2010).

Verroj jî di pirtûka xwe ya bi navê *Mehmed Mihri Hîlav û Kovara Kurdistanê* de derbarê ihtîmala Kurdbûna Fuzûlî û Dîwana wî ya Kurdî ku di destên me de tune ye, çend gotin nivîsîne. Bi heman awayî Verroj di gotara xwe ya bi navê "Ji Dîwana Fuzûlî Ber Bi Nasnameya Wî Ve" de jî dibêje Mehmed Mihri jî di nav de beşeke girîng Fuzûlî wek Kerkûkî qebûl dikin û Bexdadîbûna wî lawaz e (Verroj, 2014:44-49). Verroj ji lêkolanan biyanî û xwemalî ve derheqê kurdbûna fuzûlî de van îfadeyan jî neqil dike, lê divê ev îddîa bi awayekî zanistî bê vekolîn û mijar bê zelalkirin.

"Di *Ansîklopedîya Îslamê* de jî li ser cî û war, eşîr û qewmîyeta Fuzûlî weha tê gotin: "Di Tezkîreya Sadiqî de hatiye gotin ku Fuzûlî mensûbê eşîreta Bayatî (Beyatî) ye." Di pirtûka bi navê *Seyahatnâme-i Hudud a Mehmed Hurşîd (Paşa)* de jî Bayatî wek navê qebîleyeke Kurd hatiye nîşandan". Di *Ferhengî Kurdistan* de li hemberî peyva "Beyat" weha hatiye nivîsîn;

“tîreyêkî Kurd ê li dewr û berî şarî Kerkûk e”. Îbrahîm Xelîl Baran jî di xebata xwe ya bi navê *Eşîretên Kurd* de, “Bayatî (Beyatî)” wek navê eşîreke Kurd dîyar dike û dibêje ev eşîr “di navbera Duzxûrmatu û Kifrî de cîwarbûyî ye.” “Ji ber vê yekê, di serî de oryantalistên Rûsî yên wekî Krimskiy (1910), Cl. Huart (Encycl. De l’Islam, mad. Fuzûlî) û Minorsky (Kurds) Fuzûlî Kurd qebûl kirine.” Krimskiy dibêje “ji aliyê qewmî ve, ew ne Tirk e û ne jî Tirkê Azerî ye. Ew ji Kurdên Azerî ye, yanî mensubê qebîleyeke Îranî ye.” Cl. Huart jî dibêje “ew şaîrekî Tirkî yê nijadkurd e.” Lêkolîner Mehmet Bayrak jî dibêje, “Sê şaîrên gewre yên edebîyata Dîwanê: Fuzûlî, Nabî û Nefî nijadkurd in.” (Veroj, 2014:44-49).

Selîm Temo jî hin malikên Kurdîya Kurmancî yên ku ji bo Fuzûlî tîne nisbetkirin pêşkêşî me kirin (Temo, 2016) û ev îdia parîyekî dinê zelal bû ku bi ihtîmaleke mezin Fuzûlî Kurd e an jî tîkîlîyeke wî ya xurt bi Kurdan û Kurdî re heye.

1.1.1. Berhemên Fuzûlî

Yên bi Tirkî: Yê menzûm ev in: *Dîwan* (Dîwana Tirkî), *Leyla û Mecnûn*, *Beng û Bade* (Efyon/ Haşhaş û Şerab), *Tercemê Hadîs-i Erba’în* (Wergera Çel Hedîsan), *Sohbetu’l-Esmar* (Sohbeta Mêweyan)⁵. Yê mensûr ev in: *Hedîqatu’s Su’eda* (Bexçeyê Dilşadîyê), Hin Nameyên Wî.

Yên bi Farisî: Yê menzûm: *Dîwan* (Dîwana Farisî), *Saqîname/Heft Cam* (Heft Piyale), *Husn û ‘Eşq/Sihhat û Merez*, *Enîsu’l Qelb* (Dostê Dil). Yê mensûr: *Rind û Zahid*, *Rîsaleya Mu’emma*.

Yên bi Erebi: Yê menzûm: *Dîwan* (Dîwana Erebi). Yê mensûr: *Matlau’l-Î’îqad*.

Haluk İpekten di berhema xwe ya derbarê Fuzûlî de radigihîne ku ji bilî van berheman hin berhemên Fuzûlî yên dinê jî hene ku ew berhem hîn bi dest neketine û guman li ser hinan jî hene ku ew ên Fuzûlî ne (İpekten, 2013:36). Ew berhem ev in: *Şah û Geda*, *Lûxata Menzûm ya Çaxatayî-Farisî*, *Husrev û Şîrîn*, *Cumcumename*.

Yên bi Kurdî: Qismek ji *Leyla û Mecnûnê* (Kurdîya Kurmancî)⁶, ev jî menzûm e.

1.2. Pertew Begê Hekkarî (1756-1834?)

Li gorî çavkaniyên heta niha jiyana Pertew zêde nehatiye zelalkirin. Di çarçoveya belgeyan de Pertew Begê Hekkarî (1777-1841 an jî 1756-1834?) Kurdekî Mîrê Mîrektîya Hekarîyê ye û lawê Ebdulax Xanê Hekarî ye (Kurdo, 1992:128-129; Sağniç, 2002:423-427; Doskî, 2011:21-26; Yûsif, 2012:107-110). Pertew li Hakkarîyê hatiye dinyayê û xwendina xwe di qesra Hekkarîyê ango di Medreseya Humayûn de qedandiyê û li Hekkarîyê koça dawî kiriye û li wir hatiye veşartin (Sağniç, 2002:423-427).

Pertew Begê Hekkarî xwedî dîwanekê ye û Pertew dîwana xwe di 1221ê mişextî (1806ê zayînî) de

5 Li gorî hin lêkolanan Sohbetu’l-Esmar (Sohbeta Mêweyan) ne berhema Fuzûlî ye. Yek ji van lêkolanan jî Sedit Yüksel e ku di meqaleya xwe de ya bi navê “*Sohbetu’l-Esmâr Fuzûlînin Değildir*”, (Sohbetu’l-Esmâr Ne Ya Fuzûlî Ye) de vê yekê tîne ziman (Yüksel, 1972:115-136). Mehmet Kanar jî gava di berhema xwe ya navborî de berhemên Fuzûlî rêz dike navê vê berhemê bi lîv nake.

6 Ev berhema ku tê gotin bi Kurdî ye hîn bi awayekî berbiçav neketiye destên me. Lêbelê ji ber ku Selîm Temo çend mînakên helbestên Kurdîya Kurmancî (ji mesnewîya Leyla û Mecnûnê) yên Fuzûlî bi raya giştî re parve kir, em jî vê parvekirinê weke nîşaneyê hebûna berhemeke bi vî rengî difikirin û wê li vê derê zêde dikin. Lewra ger ev çend rûpelên di destên me de ên wî bin, ev jî hebûna berhemeke wî ya bi vî rengî nîşanî me dide.

nivîsiye. Sadiq Behaedîn Amêdî dîwana Pertew Begê Hekarî berhev kiriye û di 1978an de li Bexdadê bi tîpên Erebi çap kiriye (Dorskî, 2011: 13-15).

Li gorî ragihandina çavkanîyan Pertew, mexlesa Mistefa Begê mîrê Hekkarî ye û di dîwana xwe de mexlesên weke Pertew, Pertewî û Perto bi kar anîye. Tehsîn Îbrahîm Dorskî di sala 1989an de di kovara *Karwanê* de bi ser navê "Pertewê Kurd Mistefa Begê Mîrê Hekkarî ye" gotarek weşandiye, aşîkar bûye ku Pertew, mexlesa Mistefa Begê mîrê Hekkarî ye. Ev mîrekî mîrektîyeke kevn e û mîrê yekem ê mîrektîya Siraceddîn (hicrî 1280-1296) e. Pertew di navbera dawîya sedsala 18em û destpêka sedsala 19em de jîyaye û xwedî dîwaneke tam e. Lê tiştê ku teqez tê zanîn ew e ku wî dîwana xwe di sala 1221/1806an de xilas kiriye. Li gorî van tarîxan dema wî dîwana xwe nivîsandiye yan 29 salî, yan jî 50 salî bûye (Dorskî, 2011:21-26; Adak, 2014:317-319).

Pertew Begê Hekkarî di edebiyata Kurdîya Kurmancî de nûnerekî girîng ê edebiyata klasîk e. Di serdema mîrektîyan de yek ji helbestkarên xwedî dîwan e. Bi qasî xuya dibe, piştî Melayê Cizîrî helbestkarê duyem yê ku li gorî rêza herfan dîwan amade kiriye Pertew Beg e. Taybetîyeke wî ya girîng ew e ku Pertew Beg bixwe mîrekî helbestkar e. Pertew Beg dîwana xwe di sala 1221/1806an de xilas kiriye û katibê wî kesekî bi navê Ebdulah e. Di dîwana Pertew Beg de bi tevahî 10 qesîde, 4 texmîs, 39 çarîne, 166 xezel û piştî xezelan jî 10 helbestên dî hene (Adak, 2014:317-319).

2. METNÊN XEZELÊN HERDU HELBESTKARAN

Berîya em derbasî metnên xezelan bibin divê em behsa nusxeyên ku me ji wan sûd wergirtine bikin û bi kurtasî wan bidin naskirin.

Di pirtûkxaneyên li Tirkîyeyê û li Ewropayê derdora 100 nusxeyên Dîwana Fuzûlî ku di tarîxên cuda de hatine nivîsîn hene û hejmara nusxeyên ku di pirtûkxaneyên şexsî de ne jî nayê zanîn (Kudret, 1985:33-34). Ji bo Xezela "Ya Reb"ê ya Fuzûlî nusxeyên destxet ku di metnên rexneyî de hatine bikaranîn ev in:

Nusxeya Qûtbettîn el-Kirmanî: Herdu berhemên Fuzûlî *Dîwan* û *Beng û Badeya* ku bi Tirkîya Osmanî hatine nivîsîn di nav cildekî de ne. Mustensîxê destxetê Qûtbettîn el-Kirmanî ye, tarîx û cihê îstînsaxê hicrî 30yê Zilhicceya 1082 (mîladî:28ê Nîsana 1672)yan û Bexdad e. Ebatên wê 21.5 x 14 cm. e û 152 wêqê û bi tevahî 316 rûpel in. Ev xezela navborî di vê nusxeyê de jî heye û me ev nusxeya Qutbettîn Kirmanî weke (QK) bi nav kir (Bnr. Pêvek-I). Ji ber ku ev nusxeya destxet kevn e û di rêz-kirina malikan de jî nêzikî wergera Pertew bû me ev nusxe weke nusxeya bingeh qebûl kir. Di navbera vê nusxeyê û nusxeyên din de teqdîm û texîr çê bûye û malika 5em û 6em cî guhertine. Herweha di navbera hemû nusxeyan de ferqên biçûk jî hene (Bnr. Pêvek-I, II, III, IV).

Nusxeya Dîwana Fuzûlî: Ev jî bi Tirkîya Osmanî hatiye nivîsîn. Mustensîx û cihê îstînsaxa vê nusxeya destxet nehatiye diyarkirin. Ebatên wê 18.2 x 13.3 cm. e û bi tevahî 202 rûpel in. Xezela navborî di vê nusxeyê de jî heye û me ev nusxeya Dîwanê ku mustensîxê wê nayê zanîn weke (X) bi nav kir (Bnr. Pêvek-II).

Nusxeya Haluk İpekten: Me ev nusxe ji pirtûka bi navê Fuzûlî Hayatı Sanatı ve Eserleri ku ji

alîyê Haluk İpekten ve di sala 2013an de hatiye çapkirin wergirt. Me ev nusxe weke nusxeya Haluk İpekten (HÎ) bi nav kir (Bnr. Pêvek-III).

Nusxeya Muhsin Macit: Me ev nusxe ji pirtûka bi navê Klasik Dönem Osmanlı Nazmı ku ji alîyê Muhsin Macit, Ömür Ceylan û Ozan Yılmaz ve di sala 2015an de hatiye çapkirin wergirt. Me ev nusxe weke nusxeya Muhsin Macit (MM) bi nav kir (Bnr. Pêvek-IV).

Nusxeya Kemal Badıllı: Ev xezela "Ya Reb"ê ku ji alîyê Pertew Begê Hekkarî ve hatiye wergerandin di *Dîwana wî* de cî digire. Ev nusxeya destxeta Dîwana Pertew ji alîyê Kemal Badıllı ve di sala 1945an de hatiye îstînsaxkirin. Nusxeya vê xezelê birêz Tehsîn İbrahîm Doskî ji me re şand û me di transkirîbê de ev nusxe tenê bi kar anîye. Lewra yekane nusxeya destxet ku ketiye destê me vêga ev nusxe ye. Me ev nusxeya Kemal Badıllı weke (KB) bi nav kir (Bnr. Pêvek-V)⁷. Di rêzkirina malikan de di navbera vê nusxeya Kurdî û nusxeyên Tirkî de jî teqdîm û texîr heye û malika 4em û 6em a Kurdî cî guhertine. Li gorî metna rexneyî a Tirkî divê ev her du malikên di xezela Kurdî de cî biguherînin.

2.1. Metna Xezela Fuzûlî

Mefâ'ilün/Mefâ'ilün/Mefâ'ilün/Mefâ'ilün

+ - - - / + - - - / + - - - / + - - -

1. Benüm tek hiç kîm zâr û perîşân olmasun yâ Rab
Esîr-i derd-i 'ışk û dâğ-i hicrân olmasun yâ Rab
2. Dem-â-dem cevrlerdür çekdügüm⁸ bî-rahm bütlerden
Bu kâfirler esîri bir müselmân olmasun yâ Rab
3. Görüb endîşe-i katlümde ol mâhı budur derdüm
Ki bu⁹ endîşeden ol [meh]¹⁰ peşimân olmasun yâ Rab
4. Çıqarmak itseler¹¹ tenden çeküb peykânın¹² ol servüñ
Çıqan olsun dil-i mecrûh peykân olmasun yâ Rab
5. Dimeñ kîm¹³ 'adli yoq yâ zulmi çok her hâl ile olsa
Göñül tahtına andan ğayrı¹⁴ sulţân olmasun yâ Rab

7 Ji bo bidestxetina vê nusxeya destxet (mustensix: Kemal Badıllı) a xezela "Ya Reb"ê em ji birêz T. İbrahîm Doskî re spasdar in.

8 2a. çekdügüm: QK] çekdigüm: HÎ.

9 3b. bu: QK] ol: HÎ.

10 3b. - : QK] meh: X, HÎ, MM.

11 4a. itseler: QK] etseler: X, MM.

12 4a. peykânın: QK] peykânî: HÎ.

13 5a. kîm: X, MM, HÎ] kim: QK.

14 5b. ğayrı: QK] özge: HÎ.

6. Cefâ vü cevr ile mu'tâdem onlarsiz¹⁵ n'olur hâlüm
Cefâsına¹⁶ had ü cevrine¹⁷ pâyân olmasun yâ Rab
7. **Fuzûlî** buldi genc-i 'âfiyet meyhâne küncinde
Mübârek mülkdür ol mülk vîrân¹⁸ olmasun yâ Rab¹⁹ (Bnr. Pêvek-I)

2.2. Metna Xezela Pertew²⁰

Mefa'îlun/Mefa'îlun/Mefa'îlun/Mefa'îlun

+ - - - / + - - - / + - - - / + - - -

1. Wekî min qeṭ kesek jar û perîşan her nebit ya Reb
Esîr û derdidarê dağê hicran her nebit ya Reb
2. Ji destê wan butan her cewr û îza [û] cefakêş im
Esîrê kafiran mişala Misilman her nebit ya Reb
3. Ji bo qetla min ew dilber mudam endîşe der xaṭîr
Ji wê endîşe'ê xaṭîr peşîman her nebit ya Reb
4. Wekî mu'tadê cewr [û] derdê wan bûm û mi²¹ xo²² pê girt
Meger cewr û cefaya wan çû payan her nebit ya Reb
5. Eger çî bo me bêçaran ne wan 'edl û ne inşaf e
Ji geyrê wan li textê dil mi sulṭan her nebit ya Reb
6. Kivan²³ [û] qewsê ebrûyan ji xemzan tîrîbaran²⁴ e
Qe xalî ev dilê mecrûḥ ji peykan her nebit ya Reb²⁵

15 6a. onlarsiz: QK] anlarsuz: X, MM.

16 6b. Cefâsına: QK] Cefasine: X, MM.

17 6b. cevrine: QK] cevrine: X, MM.

18 7b. vîrân: QK] virân: MM.

19 Ji ber tercihkirinê di bilêvkirin û latînezekirina xezela bi Tirkî ya Fuzûlî de hin ferqên biçûk hene. Herweha di nav van ferqan de cudahiya herî mezin ciguherîna rêza malikên 5. û 6. e. (Bnr. Akyüz, Beken, Yüksel & Cumbur, 1958:154; İpekten, 2013:132-139; Kanar, 2015:38-39; Mengi, 2016:352-353; Macit, Ceylan & Yılmaz, 2015:226-227; Tarlan, 2013:91-94; Parlatır, 2014:197) Herweha di yên destxet de jî cudahî hene (Bnr. Pêvek-I. II. III. IV.).

20 Ji bo vê xezelê, destxeta Kemal Badıllı ku T. İbrahim Doskî ji me re şandiye bingeh hatiye girtin (Bnr. Pêvek-V).

21 Ev zamîr di axaftina roja me de di gelek devokan de dişa weke "mi" tê bilêvkirin, lêbelê di nivîsa kitêbî de tîpa dawî "n" jê nayê xistin û weke "min" tê nivîsîn û bilêvkirin.

22 Ev cînavka "xwe" di devoka Hekarî de bêtir weke "xo" tê bilêvkirin û bikaranîn.

23 Ev bêje di Kurmanciya îro ya rojane de weke "kevan" tê bilêvkirin û bikaranîn. Lêbelê ji be ku nişaneyê "cir/kesre"yê di destxeta di destê me de xuya dikir, me jî ew weke "kivan" nivîsî.

24 Ev peyv "tîrebaran" an jî bi forma Farisî "tîr-i baran" jî dikare bê xwendin û herweha bi vî awayî kêşa wê jî xera nabe. Ev riste weha jî dibê: "Kivanê qewsê ebrûyan ji xemzan tîrebaran e".

25 Di hin nusxeyê vê xezelê de teqdim û texîr çê bûye yanî cihê hin beşên metnê hatiye guhertin. Nimarekirina malikên vê xezelê jî aliyê me li gorî rêzêkirina malikên xezela jor a Tirkî hatiye kirin.

7. Te²⁶ kuncê meykedê kuncêk tamam ez 'afiyet **Pertew**²⁷
Kû kir tehşîl ew kuncik qe wêran her nebit ya Reb²⁸ (Bnr. Pêvek-V)

Latînzekirin û nivîsandina bi tîpên Kurdo-Erebîk ya vê xezelê bi gelek awayên cuda hatine kirin. Her lêkolerî li gorî zanebûn, nusxe û destxetên di destên xwe de bi formekê latînzê kiriyê û bi tîpên Aramî/Erebî daye çapkirin û weşandin. Ev tercîha wan hem ji bo herfên Kurdo-Erebîk ya ku Soran li gorî xwe formeke cuda bi kar tînin û hem jî ji bo latînî derbasdar e û cudahî di navbera wan de hene. Lê divê ji bo xebatên bi vî rengî formeke standart derkeve holê. Li vê derê jî heta ji dest hatiye hewla formeke standart hatiye dayîn.

3. ANALÎZ Û BERAWIRDKIRINA HER DU XEZELAN

3.1. Ji Alîyê Ruxsarî ve Analîz û Berawirdkirina Herdu Xezelan

Em dikarin hin taybetîyên xezelê yê ruxsarî weha rêz bikin:

TAYBETÎ	HELBESTKAR	
	Fuzûlî (1480?-1556)	Pertew (1756-1834?)
Serdem	Sedsala 15.-16.	Sedsala 18.-19.
Herêm	Iraq-Derdora Bexdadê ?	Herêma Hekkarî
Ziman-Zarave	Tirkîya Azerî	Kurdîya Kurmancî û Devoka Hekkarî
Teşeya Nezmê	Xezel	Xezel
Yekeya Nezmê	Xane / Malik	Xane / Malik
Hejmara Malikan	7 Malik	7 Malik
Kêş, Qalib û Behra Erûzê	Mefa'îlun / Mefa'îlun / Mefa'îlun / Mefa'îlun (Behra Hezecê)	Mefa'îlun / Mefa'îlun / Mefa'îlun / Mefa'îlun (Behra Hezecê)
Serwa	"an" Serwaya murdef e	"an" Serwaya murdef e
Şemaya Serwayê	aa / ba / ca / da / ea / fa / ga	aa / ba / ca / da / ea / fa / ga
Paşserwa	olmasun ya Râb	her nebit ya Reb
Mexles û Cihê Wê	Fuzûlî / Malika dawî	Pertew / Malika dawî

Dema em bala xwe didin herdu xezelan, em dibînin ku di navbera wan de ji hêla şêweyê ve hin cudahîyên biçûk hene. Lêbelê ev cudahî ji bo wergerekê ne zêde ye û normal e.

Nusxeya vê xezelê ya ku Fuzûlî bi devoka Azerî nivîsiye û nusxeya Pertew Begê Hekkarî ku he-man xezel wergerandiye Kurmancî, gava tên muqayesekirin, xuya dibe ku di rêza malikên xezelê de guherînek çêbûye û hin malikan bi hev re cî guhertine. Di vê berawirdê de em dibînin ku di wergera

26 Ev di nusxeyên metbû' de weke "Ti" hatiye nişandan (Bnr. Pêvek-VI, VII). Ger "ti" be jî divê ev daçek weke "di" bê fêmkirin.

27 Ev mexlesa helbestkar weke "Perto" jî dikare bê xwendin û nivîsîn.

28 Ji bo formên cuda yê vê xezelê (Bnr. Pêvek-VI.VII) û nusxeya destxet ya vê xezelê (Bnr. Pêvek-V).

wê ya Kurdî de teqdîm û texîr çêbûye. Yanî cihê hin malikên xezelê hatine guhertin û divê malika di rêza çarem û şeşem de ne cî biguherînin. Em dizanin ku di navbera nusxeyên xezela Tirkî de jî di rêz-kirina malikan de hevgerînek tune. Dibe ku ev tevlihevîya di rêz-kirina malikan de derketiye holê ji xeletiyên nusxe û mustensîxan ve pêk hatibe. Yanî dema ku nusxe ji ber nusxeyê ji aliyê mustensîxan ve hatibe zêdekirin ev guhertin çêbûbin. Ji ber ku nusxeyêke destxet tenê ya xezela Pertew li ber destê me ye em bi teqezî nizanin xeletî ji ku dest pê kiriye. Îhtîmal e ku Pertew jî li gorî nusxeya ber destê xwe wergera xwe pêk anîbe. Çunkî gava em li nusxeyên vê xezela Fuzûlî dinihêrin em dibînin ku di navbera nusxeyan de cudahî hene û hejmara nusxeyên wê jî zêde ye. Mesela di hin bêje û rêz-kirina hin malikan de di navbera metna xezela di pirtûka Tarlan û destxeta di pêvek-1ê de jî hin ferq hene. Lêbelê ferqên wê li gorî nusxeyên din kêmtir in (Bnr. Tarlan, 2013:91-94; Pêvek-1).

Di helbestê de kombêjeyên ku di her malikê de tên dubarekirin "her nebit ya Reb" paşserwa ye û herdu tîpên "an" ku di dawîya bêjeyên "perîşan, hicran, Musilman, peşîman, payan, sultân, peykan, wêran" de hene jî serwa ye û ji ber ku du tîpên dubarekirî ne û berîya herfa rewîyê ji herfa rîdfê "î" (a) hatiye ev jî dibe serwaya murdef (qafiyeya tam). Ev her heşt bêje di herdu xezelan de jî heman bêje ne û herweha serwaya wan jî yek e.

3.2. Ji Alîyê Naverokê ve Analîz û Berawirdkirina Herdu Xezelan

Em dikarin hin taybetiyên xezelê yên naverokî ji weha nîşan bidin:

TAYBETÎ	HELBESTKAR	
	Fuzûlî (1480?-1556)	Pertew (1756-1834?)
Cûreya Nezmê	Xezela aşiqane û tesewîfî	Xezela aşiqane û tesewîfî
Ji Alîyê Naverokê	Xezela Yek-awaz û Yek-aheng	Xezela Yek-awaz û Yek-aheng
Mijar	Êşa evînê, dilxweşîya kişandina eziyetên ji evînê.	Êşa evînê, dilxweşîya kişandina eziyetên ji evînê.
Tema	Evîn û êş e (Tesewîfî ye).	Evîn û êş e (Tesewîfî ye).

Ji bo ku naveroka wê baştir were fêmkirin me xezel malik bi malik adapteyî Kurmancîya îro kir. Hemû malikên vê xezela ku Pertew wergerandiye Kurdî ji hêla me ve bi zimanê îro bi "Kurdîya standart" hate adaptekirin û di adapteya wê de kêşa erûzê li ber çavan nehatiye girtin.

1. Kesek wekî min qet jar û perîşan nebe ya Reb
Kesek nebe esîrê derdê eşq û birîndarê hicranê ya Reb
2. Ez her tim ji destên pûtên bêrehm pir cefayê dikêşim
Ti misilmanek qet nebe esîrê van kafiran ya Reb
3. Ew dilber ji bo qetla min her tim bi fikar e
Bila ji wê fikarê qet pîşman nebe ya Reb

4. Zilm û derdê wan ji min re adet bû û min xwe pê girt
Bila zilm û zordarîya wan qet bi dawî nebe ya Reb
5. Herçiqas ji bo me bêçareyan, bê edalet û insaf in ji
Bila ji bilî wan li textê dilê min kes nebe sultan ya Reb
6. Ji kevan û qews û birûyan, tîrîbaran e ji xemzan
Ev dilê birîndar ji sertîran, qet vala nebe ya Reb
7. **Pertew** te di qunca meyxaneyê de ji sihetê quncikek dît
Ew quncik ku te tê de tehsîl kir, qet wêran nebe ya Reb

Ger em van malikên ku bi nezmê hatine nivîsîn têxin forma nesrê (pexşan) û bi Kurmancîya sade lê hûr bibin û me'neya wan şîrove û tehlîl bikin em ê bigihêjin vê encamê: Li vê derê helbestkar di xezela xwe de bangî Xwedê dike. Helbestkar; di van malikan de bi aşkereyî dide xuyakirin ku naxwaze ji van êş û kederên xwe xelas bibe, ew dixwaze bi van êş û kederan re bijî. Ji bo evînê mirinê dide ber çavên xwe. Ditirse ku yara wî dev ji kuştina wî berde û ji ber vê yekê jî bi endîşe ye. Ew dixwaze ji ber derdê evînê bimire û wenda bibe. Evîna li vir evîneke yekalî ye (platonîk e). Di tesewifê de evîndar di vê baweriyê de ne ku ger ji ber derdê evînê jîyana xwe ji dest bidin, ew ê bi Xwedê ve bibin perçeyek. Di malikên vê xezelê de hin bêjeyên tesewifî yên weke meykede û kunc/qunc derbas dibin. "Meykede/Meyxane" di tesewifê de tê maneya "dergeh-tekyayê", ji ber vê jî di tesewifê de ev der cîyekî pîroz e û li vê derê evîna Xwedê dikeve dilê 'evdan. Helbestkar dema ku li dergehê bi tenê dimîne, xwe di nav aramîyê de hîs dike. Helbestkar xwestiyê van tiştan bi me bide zanîn. Ev xezeleke tesewifî ye, lê hêmanên xezela aşiqane jî tê de hene, unsûrên tesewifî û aşiqane bi hev re hatine bikaranîn û têkeli hev bûne.

Alî Nihat Tarlan li ser peyvên "but" û "kafir" ku di vê xezela Fuzûlî de derbas dibin weha dibêje:

Ji bo evîndaran kişandina derdê eşq û veqetîna ji yarê weke mezîyetekê, weke taybetîyeke mezin û payebilind e. Daxwaza wan ya sereke nalîn û perîşanî ye, lewra bi vê yekê amanc ew e ku bigihêjin mertebeyeke bilind. Di edebîyata klasîk de but li dewsa dilber û xweşikahîyê tê bikaranîn, kesê/a xweşik jî li ser rûyê erdê nîşane û zihûreke ji Xwedê ye û gava but ji bo tiştê bêcan were bikaranîn ev dibe kufir. Ji ber ku kufir bêcan e û xwe weke Xweda dide qebûlîkirin, but û xweşik bi xweşikahîya xwe ya madî ve xweşikahîya Xwedê dinuxumîne û ji ber vê yekê jî ew dibe kafir. Kafir tê maneya kesên dinuxumîne. Ji ber ku ev xweşik jî evîndaran ber bi xwe ve dikişînin, dibin sedema veqetînê. Ev yek jî ezîyet û cefa ye. Evîndarên ku tama xweşikahîyê nas dikin û pê ve, tîr girêdan û ew evîndar ji bo ku ji mecazê derbasî rastîyê bibin gelekî êş û ezîyetê dikişînin. Cewr û cefaya butan ev e. Bi gotina ku dibêje "bila Misilmanek nebe hêsîrê van kafiran" jî tê vê maneya ku naxwaze Misilmanekî ku namzedê gihaştina heqîqetê ye, bibe hêsîrê vê xweşikahîya mecazî. Mertebeya herî dawî ya êş û ezîyetê hêsîrketina di destên kafiran de ye (Tarlan, 2013:91-94).

Peywira xweşikahîya mecazî dûrxistina aşiq ji alema madî ye û têkilîya wî ya manewî ji cîhanê qutkirin e. Yanî bi awayekî manewî kuştina evîndar e (Tarlan, 2013:92). Lewra evîndar jî li vê derê

kuştina xwe dixwaze. Êş û ezîyeta sertîran ji helbestkar re ew qas şêrîn hatiye ku êdî qet naxwaze ew sertîrên ku di dilê wî de hatine çikandîn, derkevin. Yanî naxwaze ji derdê vê evîne were xilaskirin û mirîna xwe tercîhî vê yekê dike, yanî tercîhî derketina sertîran dike. Li vê derê sertîrê eşa eşqa wî ye ku ji alîyê yarê ve hatiye dayîn.

Meyxane xezîneya eşqa îlahî ye û şerab jî eşq û evîna îlahî ye (Tarlan, 2013:94; Kaplan, 2007: 245-251). Ev evîna îlahî ji ya mecazî gelekî cuda ye û jê biqîmet û binirxtir e. Helbestkar xwestiyê bibêje ew di eslê xwe de ne meyxaneyêke, lê ew milkekî pîroz e û ji Xwedê dixwaze ti zerar negihêje wî milki. Ew milk ji helbestkar re cihê kêfxweşî û dilşadîyê ye. Herweha kunc/genc jî ji helbestkar re cihê bi qîmet û şanazîyê ye ku li wir digihêje zengîneyekê.

3.3. Ji Alîyê Nezîre, Întihal û Wergerê ve Analîz û Berawirdkirina Herdu Xezelan

3.3.1. Ji Alîyê Nezîreyê ve Analîz û Berawirdkirina Herdu Xezelan

Di van xezelên li ber destên me de; du dem, du helbest, du helbestkar, du ziman; lê yek mijar û yek ma'ne heye. Weke tê dîtîn ku ev xezela ku li jor bi du zimanan hatiye nîşandan, bi eslê xwe ji alîyê Fuzûlî û bi Tirkîya Azerî hatiye nivîsîn. Lê di vir de jî wergera wê ya bi Kurdîya Kurmancî ji hêla Pertew Begê Hekkarî ve bi awayekî serkeftî û hunerane hatiye kirin.

Di edebîyata klasîk de ji bo helbestan bi dehan şerh, nezîre û cûreyên nezîreyê hatine nivîsîn. Di helbesta klasîk de ev bikaranîn wek kevneşopîyekê dihate dîtîn û di dema me de jî ev kevneşopî kêma zêde didome (Köksal, 2018:105-111). Gava em li edebiyata klasîk dinihêrin em dibînin ku di sed salên dawî de jî bi vê kevneşopîyê berhemên bi vî rengî hatine dayîn.

Bi heman serwa, paşserwa û kêşê ve hin riste li helbestekê bîna zêdekirin jê re "nezîre" tê gotin (Köksal, 2018:15-24). Yanî bi heman teşe û kêşê ve helbestek an hin riste li helbesteke dinê bîna zêdekirin an jî di çarçoveya hin prensîban de pê re bê şibandin nezîreyê pêk tîne. Bi piranî serwa, paşserwa, kêş, tema û îfade di nezîreyan de bi helbesta bingehîn re hevpar in.

Di çavkanîyan de bi gelemperî derbarê nezîreyê de kêma zêde weha tê gotin: Nezîre ji peyva Erebi ya "nezzr"ê hatiye çêkirin û bi maneya "şibandin û wehkevî"yê ye. Nezîre ew helbest e ku ji alîyê helbestkarekî/ê bi heman yekeya nezmê, bi heman kêş, serwa û paşserwayê ve weke helbestekê hatiye nivîsîn.

Ji karê nivîsîna nezîreyê re jî "tenzîr" tê gotin. Di helbestên bi vî rengî de divê mijar jî heman bin. Di edebîyata klasîk de ji bo nezîreyê girîngîyêke zêde hatiye dayîn. Hema hema her helbestkarî ji helbestên helbestkarên berîya xwe û yê hemdemên xwe re nezîre nivîsîne û bi vê rêyê xwestine hunera xwe pêşkêş bikin û pesnê xwe bidin. Di edebîyatê de nivîsîna nezîreyên ji helbestên helbestkarên hoste re bûye sedema çêbûna kevneşopîyekê. Nezîreyên ku ji şibandina hin helbestan derketine holê gelek in û hin ji wan nezîreyan ji helbesta çavkanî serkeftîtir û hêjatir jî derketine holê. Herweha nezîre ne teqlîdek ji rêzê ye (Kaplan, 2017:38-39; Köksal, 2018:15-24).

Di edebîyata klasîk a Tirkî de yek/a ku nezîre li helbesta Fuzûlî nekiribe hema hema tune ye. Her

helbestkarê edebîyata Tirkî ya klasîk bûye heyranê hunera Fuzûlî û piranîya wan helbestkaran li helbêstên wî nezîre nivîsîne. Feqet ya ku Pertew li vir kiriye herçiqas taybetîyên nezîreyê di xwe de vedihewîne jî ne nezîre ye. Di helbesta klasîk de em wê weke wergereke orjînal dibînin û divê ev werger weke wergereke serkeftî bê hesibandin. Ji ber ku Pertew hemû helbest wergerandiye zimanekî dinê û perçeyên nû li helbestê zêde nekiriye me ev bi nezîreyê nehesiband û me ew rasterast bi wergereke edebî û serkeftî qebûl kir.

Gava em bala xwe didin berhemên wan em dibînin ku hin helbestkarên edebîyata klasîk, herî kêma bi du zimanan dizanibûn. Hin ji helbestkarên wê demê yên Kurd zimanên weke Erebî, Farisî û Tirkî jî dizanibûn. Herweha nivîskarên biyanî jî bi çend zimanan dizanibûn û ji tezkîre û berhemên wan jî tê fehmkirin ku helbestên helbestkarên hevdemên xwe û yên berîya xwe jî dişopandin. Em ji nezîre, şerh û wergerên heyî jî dikarin vê peyrewî û şopandina vî tiştê ku bûbû weke kevneşopîyekê bi hêsaniyê bibînin. Lewra em dikarin bibêjin ku ev wergerên helbestên wê dewrê ku ji zimanekî ji bo zimanekî dinê hatine kirin di çarçoveya vê kevneşopîyê de ne û bi piranî ji bo pesn û hunerê hatine kirin. Çawa ku helbestkaran ji bo hunermendî û zanîna xwe derxînin pêş serî li şerh û nezîreyê dane; her weha dişa ji bo pesn, huner û zanîna xwe îsbat bikin, serî li werger û adapteyan jî dane û ev xezel jî ji bo wergera helbestan mîna keke xweş ya vê kevneşopîyê ye. Em dikarin ji bo têkilî û danûstandina di navbera herdu edebîyatan de mînakên wergerên helbestan zêdetir jî bidin.

Em dizanin ku di sedsala 19an û 20an de jî kesên weke Xelîl Xeyalî, Mihemed Mihrî û Keyfî jî wergerên helbestan kirine (Adak, 2015:75-110; Veroj, 2017:113-120). Xeyalî bi helbestkî û ji Tirkî ber bi Kurdîya Kurmancî ve; Keyfî û Mihrî jî bi pexşankî û ji Hewramî û Soranî ber bi Tirkî ve wergerên xwe kirine.

Ev fikra ku me di mijara wergerên edebîyata klasîk de anîye ziman bi van îfadeyên Ayhan Tek jî tê piştrastkirin: "Di edebîyata klasîk de şairan "kevneşopîya Îranê" bi rêya wergerê adapte kirine û bi vê rêyê hem atmosfereke edebî hem jî berhemeke edebî derxistine holê. Çunkî di edebîyata klasîk de weke kevneşopîya nezîreyê, kevneşopîya wergerê jî roleke mezin pêk anîye û ji bo şair bûye rêya bidestxistina berhem û zewqeke edebî. Metnên werger yên ku em di edebîyata klasîk de dibînin, ji metnên werger ên modern cudatir in. Çunkî wergêr metna ku bi rêya wergerê bi dest xistiye ji xwe re weke berhemeke telif dibîne. Ji ber vê yekê wergêrê ku di heman demê de şair e jî vî tiştê ku werdirêne û radigihîne weke wergerê nabîne û wî tiştî weke telifê dibîne (Tek, 2018:101-102). Herçiqas ev kevneşopîya ku Tek jî di nav de ji aliyê hin lêkolanan ve hatiye ziman ji bo mesnewîyê be jî em dibînin ku ev îfade ji bo helbestkarên ku helbest wergerandine zimanekî din jî derbasdar e.

Ev wergera Pertew me ji tiştêkî din jî agahdar dike, ew jî ev e ku Pertew di dema xwe de helbestkar û edebîyatên zimanên din ên berîya dewra xwe jî şopandine û ji helbestkar û edebîyatên heyama berê jî agahdar bûye. Ew edebîyat, ne tenê edebîyata Kurdî ye û ew helbestkar jî ne tenê yên Kurd in. Bi saya vê wergerê em dizanin ku Pertew, edebîyat û helbestkarên biyanî jî şopandîye û bi şopandinê tenê nemaye, heta ji wan werger jî kiriye û ev xezel jî ji bo vê yekê mîna keke baş e.

3.3.2. Ji Alîyê Întîhalê ve Analîz û Berawirdkirina Herdu Xezelan

Întîhal, bêjeyeke Erebi ye û ji koka "nahl"ê hatiye dariştin. Întîhal, bi awayekî neheq xwedîderketina li berhemekê ye. Heke ji alîyê kesekî ve ji berhemên nivîskar û helbestkarên din nivîs, beş, perçe an jî riste bîn sitandin û weke malê kesekî din bide xuyakirin, ji vê yekê re întîhal (dizî) tê gotin. Întîhal, jêgirtin an jî îlhamgirtin, ji berê ve qada edebîyatê mijûl dike. Întîhal mijareke wisa ye ku îsbatkirina wê gelek zor û zehmet e. Zehmetiya wê jî ji vir tê ku tesbîtkirina sînoren wê ne hêsan e. Bi piranî întîhal di berhemên biyanî de çê dibin, çunkî tesbîta întîhala berhemên bi zimanê biyanî ji yên din dijiwartir e (Karataş, 2005:67).

Gava fikr û berhemên kesên din û nivîsên jêder, nekevin nav dunikan (" ") û bêyî nîşandayîna jêder û çavkanîyan were nivîsandin û hwd. dibe mijara întîhalê. Ger ev întîhal di warê helbestê de be ji wan kesên ku ev kar kiriye re "duzd-î suxen" (dizê peyvê) tê gotin û ji wî karî re ku hatiye kirin jî "sîrçet-î şî'r" (dizîya helbestê) tê gotin. Ji dizîya bêguhertin re întîhal û ji ya biguhertin re "îgare" yan jî "mesh" tê gotin û ji dizîya ma'neyê re jî "îlman" tê gotin (Mevlevî, 1994:67-70; Develioğlu, 2003:443; Karataş, 2005:65-68; Pala, 2007:233-234; Türk Dili ve Edebiyatı Ansiklopedisi, 1981; Kaplan, 2017:39-98). Eger berhem û ramanên kesên din bêyî çavkanî, bi awayekî din bîn nivîsîn an vegotin ev jî dibe întîhal. Ji bo ku ev tişt nebin întîhal divê ji xwedîyên berheman destûr bê stendin û navên wan di çavkanî û jêderkan de bîn destnîşankirin (Tosun, 2005:86-90).

Ji van danasînan jî tê fêhmîkirin ku bikaranîna tişteki bêyî destûra xwedîyê wî/ê û dîsa ji veşartina navê xwedîyê wî/ê tiştî re "întîhal" tê gotin.

Weke tê ditin ku ev xezela mijara vê xebata me bi eslê xwe ji alîyê Fuzûlî û bi zarevayê Azerî hatiye nivîsîn. Lê di vir de jî wergera wê ya bi Kurdî ji hêla Pertew Begê Hekkarî ve bi awayekî xweş û hunerane hatiye kirin. Ji ber ku Pertew Beg di dawîya vê xezelê de ne mexlesa "Fuzûlî", lê mexlesa xwe "Pertew/Perto" bi kar anîye; ji alîyê întîhalê ve gumanek peyda dibe. Lêbelê em dibînin heman tişt ji alîyê Fehmî Begê Pêçarî ve jî hatiye kirin û ev yek jî teza me xurttir dike ku ev tişt kevneşopî ye û ne întîhal e. Eger Pertew mexlesa Fuzûlî bi kar anîbûya me yê rasterast bigota ev bûye werger, lê ev tişt di vir de pêk nehatiye û Pertew mexlesa xwe di xezelê de bi kar anîye. Li vê derê divê em li bersiva hin pirsên din jî bigerin.

Di heyama kevn a edebîyata klasîk de gelo helbestkar û wergêrên helbestan bi kîjan rêbazê navê xwe û navê nivîskarê metnê di bin wergerê de didan nîşandan? Bersiva vê pirsê hîn bi awayekî zelal derneketiye holê û ev mijar baş nehatiye tesbîtkirin. Ji alîyê dinê ve jî hêj di mijara wergera helbestan de jî di nav edebîyatnas û rexnegiran de jî nîqaş berdeham in û lihevkinînek derneketiye holê. Li gorî nêrînekê helbesta ku ji zimanekî bê wergerandin li ser zimanekî din, êdî ew helbest ji nû ve tê dariştin û herweha ew helbest jî dibe helbesta wergêr ango ew dibe telîfa wergêr. Nêrîneke din jî jixwe berevajî vê yekê ye û karê ku tê kirin jî weke wergerê dibîne û wî karî bi tenê werger dihesibîne û ew weke telîf nabe malê wergêr (Özgül, 2005:52-64).

Feqet pîrsek din jî heye, gelo di wê heyamê de (dewra Pertew) agahîya wan helbestkarên Kurdî jî întîhalê hebû yan tunebû? Belê haya wan jê hebû, weke nimûne Melayê Cizîrî (1570-1640) (Dilovan, 2013:300) berîya Pertew jîyaye û Mela 'Elî 'İlmî Zîla (1923-1995) (Zivingî, 2012:122-123)

jî piştî Pertew jîyaye û ev herdu helbestkar ji wan helbestkaran du kes in ku haya wan ji întîhalê yanî dizîya berhemên edebî hebû û li ser întîhalê jî helbest nivîsîne. Lêbelê tiştê Pertew li vir kiriye werger e û Pertew jî di çarçoveya kevneşopîya pesindayîna hunerê de ev wergera nuwaze pêşkêş kiriye.

Nêrîna me ev e ku bi piranî helbestkarên wê demê tenê bi çavên hunerê li van wergeran nêrîne û daxwaza wan jî tenê pêşkêşkirina zanîn, huner, pesn, zîrekî û danberhevkirina hunerê bûye. Ji ber ku Pertew di xaneya texelusê de mexlesa xwe bi kar anîye ev yek nikare weke întîhalê bê hesibandin. Lewra mexles di wê heyamê de weke îmzeyê dihat bikaranîn û bi vî awayî dihat zanîn (Kurnaz & Çeltik, 2011:3). Ger mexles tune bûya me yê bi awayekî teqez nekarîba îdia bikira ku ev werger ya Pertew e. Bi saya mexlesê ev îdiaya me xurtir û tekûztir dibe ku ev wergereke Pertew e û tê dîtîn ku ev helbest wergereke gelekî serkeftî ye.

Berîya ku helbestkarek bi întîhalê were sûcdarkirin divê kesê wî sûcdar dike pêşî termînolojî û cîhana kevneşopîyê baş bizanibe. Li gor ku M. Kayahan Özgül dibêje, "Kevneşopî, kesên ku ji bo helbesteke yekî/a din bigota ya min e, ew kes bi tenê bi întîhalê sûcdar dikir. Lêbelê di mekanekî weha de ku danûstandina helbestên heman çandê hebûn ev yek jî tiştêkî tebiî û asayî dihat dîtîn û wergirtinên ji hev û din û wergirtinên ji kesên berîya xwe întîhal nedihat hesibandin" (Özgül, 2005:58).

Di helbestê de divê li ser wergeran jî bi baldarî bê sekinandin ku weke çavkanîya întîhalê tê bilêvkirin bi baldarî bê sekinandin. Çunkî di helbesta edebîyata klasîk de kevneşopîyeke heye û divê ev kevneşopî neyê piştguhkirin.

Özgül mafê xwedî derketina li metnên wergerandî dide wergêr û vê yekê weha îzah dike:

Kevneşopî, bêyî ku li dirêjahîya metnê binêre destûrê dide mutercîm ku xwedîtîyê li metnên ku bi rêya tercumeyên ku ji Erebi û bi taybetî jî ji helbesta Ecem hatine standin bike. Bi tenê berpirsariyeke şairê mutercîm heye, ew jî ev e ku wergera wî ji aliyê ma'ne û bilêvkirinê ve ji zimanê berhema orijînal xweştir be. Aşkerenekirina tercumeya şîr, rêzik an jî fikrê ne li dijî exlaqê poetîkaya kevneşopîyê ye. Nîşandayîna wê jî dibe îqtîbas û wê demê jî êdî li holê curmeke ku dê bi întîhalê were sûcdarkirin namîne. Bi temamî ji ber vê sedemê ye ku gava di sedsala XIXan de di helbesta Rojava de tercume hatin destpêkirin; an dê tercumeyên gelek helbestan nehatana nîşandan an jî dê berhem di bin navê mutercîm de bihatana weşandin (Özgül, 2005:63).

Özgül, derbarê werger û wergêran de weha didomîne û dibêje, "Herçiqas her tercume û mutercîm nebe jî; şîrên ku ketibe destên şairên mutercîm ên hoste êdî ew şîr ji nû ve tên dariştin û ji ber vê yekê divê ew weke berhemên kesên mutercîm werin hesibandin. Bi kurtî şairê ku sûtê ji şîra kesekî werbigre û di bin fikr, hêma/îmge û nukteya şîra wergirtî de neeciye û bikaribe wê şîrê bi pêşdetir bibe û xweştir bike ew şair ne diz e" (Özgül, 2005:63-64).

Li gorî Özgül divê întîhal di nav poetîkaya şîra klasîk de were nixandîn. Özgül radigihîne ku întîhal bi maneya îro di sedsala XVIIIem de ketiye edebîyata Rojhilat û Rojava û şair wê demê li ser întîhalê sekinîne. Di çaryeka duyem ya sedsala XIXem de jî di navbera şairan de ev fikra întîhalê bi hêz bûye û bûye sedema endîşeya şairan (Özgül, 2005:57-60). Di edebîyata Kurdî de weke nimûne di sedsala 16em de em bi Melayê Cizîrî re û di sedsala 20em de jî bi Mela 'Elî 'İlmî (Zîla) re rastî vê

endîşeyê tîn ku wan jî ev mijar di helbestên xwe de anîne ser ziman.

Turan Karataş jî dibêje Cemil Çiftçi nivîsek nivîsiye li ser şewaza întihalkirinê di heyameke ku metbea tunebû û her tişt bi hêsanî û bi lez nikarîbû bihata zêdekirin û qeydkirin encex bi destan dihat kirin. Karakaş ji Çiftçi weha radigihîne, "Nivîskarên tezkîreyan û şair rê nadin teqlîd û dizîya şîran; îtibara xwe bi şairên weha nînin. Kîjan şair rastî neheqîyê were û kîjan şîr were dizîn, vê yekê aşkere dikin û şerma wan li rûyê wan dixin" (Karataş, 2005:67). Tiştê ku Karataş û Çiftçi anîye ziman em dibînin ku ji alîyê helbestkarekî Kurd ve jî hatiye tebîqkirin. Melayê Cizîrî di helbesta xwe de helbestkarekî din bi diziyê îtham dike û vê yekê bi rêya helbesteke xwe tîne ser ziman. Di çarçoveya vê zanyarîyê de jî em dibînin ku li ser helbestkarên berê çavek heye û biçûk be jî venêrin û kontrolê hatiye kirin. Ev kontrol û rexne jî bi rêya berhemên nivîskî yên weke helbest û tezkîreyan jî hatiye kirin.

Tahîr-ul Mewlewî jî radigihîne ku bi rêya tercume û neqla maneyê ve pejirandina fikrekê, îxtîlaf e ku bi întihalê were hesibandin. Herweha Mewlewî xwe dispêre Mola Camî û dibêje gava ku uslûb û ziman were guhertin ew nabe întihal (Mevlevî, 1994:67-70).

Fuzûlî di edebiyata klasîk a Rojhilata Navîn de yekî pir bi navûdeng û bi huner e; mîna Şîrazî, Xanî, Cizîrî, Baqî, Heyyam û Mewlana meşhûr e. Ev xezela ku Fuzûlî nivîsiye jî xezelek pir hunerane û gelekî meşhûr e. Jixwe helbestkar bi armanca ku hunermendiya xwe derxîne holê helbestan dinivîse. Ji bo ku bikaribe hunera xwe nîşan bide li ser helbestên helbestkarên binavûdeng nezîreyan dinivîse û heta helbestên wan ên gelekî xweş û hunerane jî werdigerîne ser zimanê xwe yê ku pê dinivîse.

Di edebiyata Kurdî de em dibînin ku bi vî rengî Pertew Begê Hekkarî û Fehmî Begê Pêçarî (Namî) (1910-1969)²⁹ ev kevneşopî dewam kirine û xwestine hunera xwe bi rêya wergerandina helbestên Fuzûlî jî nîşan bidin. Lewra ew, helbestên Fuzûlî dicibînin û ji bo wan helbesta Fuzûlî pîvaneke hunerê ye. Pêçarî (Namî) xezeleke heft malikî ya Fuzûlî texmîs kiriye û di heman demê de ev xezel wergerandiye Kurdîya Kurmancî jî. Em bi vê yekê dibînin ku Fuzûlî bandor li Fehmî Begê Pêçarî jî kiriye. Herweha çawa ku Pertew Begê Hekkarî li cihê mexlesa Fuzûlî mexlesa xwe "Pertew" bi cî kiriye, bi heman awayî Fehmî Begê Pêçarî jî mexlesa xwe ya "Namî" di benda mexlesê de bi kar anîye û mexlesa "Fuzûlî" jê derxistiye. Malika ewil û ya dawî ya vê xezela Fuzûlî weha ye:

1. Aşiyân-ı murg-ı dil zülf-i perîşanundadur
Kanda olsam ey perî gönlüm senün yanundadur

7. Ey **Fuzûlî** şem'-veş mutlak açılmaz yanmadan
Tablar kim sünbülünden rişte-i cânundadur (Tarlan, 2013:244-246)

Texmîsa Namî ji heft bendan ve pêk tê. Di texmîsê de her sê risteyên serî yên Namî ne û her du risteyên dawî jî yên Fuzûlî ne. Serwaya texmîsê: aaa(aa), bbb(ba)... ye. Benda ewil û ya dawî ya Fehmî Begê Pêçarî (Namî) jî weha ye:

29 Namî, yek ji mexlesa Fehmî Begê Pêçarî (Hasan Akgül) ye û ev helbestkar li gundê Pêçara Liceya Diyarbekirê hatiye dinyayê û ew jî ji malbateke mîr tê û "Beg"bûna wî jî ji wir tê. Di sedsala 20. de bi terza klasîk bi Kurdîya Kurmancî li gorî kronolojiya elîfbayê diwanek helbestan nivîsiye (Demir, 2019).

1. Meşriqê amalê qelbim çêsmê tabanê tu da
Gonçê bext û umîdem le'lê xendanê tu da
Menbe'ê abê heyatim cahê zenexdanê tu da
Aşiyânê murgê dil zulfê perîşanê tu da
Ger li kû bî ey perî dil min di seyrânê tu da

7. **Namiya** fariğ nemayî her çiqas ez naleyan
Çunkê tabê dil nehin bê cewr û ba îşkenceyan
Bernede destê umîd ez damenê durdaneyan
Ta bibînî nazenînê der şîbak û baceyan
Pê dizanî mutleqa yar can e der canê tu da (Demir, 2019:105-106)

Pertew jî Namî jî xwestine li ser xezelên navborî yên Fuzûlî hunermendîya xwe bidin xuyakirin û bi vê mebestê bi şarezayî ev xezelên navborî wergerandine ser zimanê xwe. Her duyan jî bi zimanê hunermendîya xwe xwestine bibêjin; va ye em jî hespê xwe di vê qada hunerê de dibezînin, em jî ne kêmi Fuzûlî ne, em jî dikarin mîna Fuzûlî helbestan binivîsinin û em jî ji çend zimanan fêhm dikin û wan dizanin. Ji ber hindê meqseda Pertew û Namî ji van helbestan ne întîhal e, belkî pesn û nîşandana şiyana xwe ya di nezmê de ye.

Gava em qaîdeyên kevnoşopîya edebîyata klasîk li ber ber çavan digirin; em vê xezela ku Pertew wergerandiye Kurdîya Kurmancî bi întîhalê nahesibînin. Lewra ev wergerê ji zimanekî din e. Mexles îmzeya helbestkar e, ji bo ku Pertew mexlesa xwe di xezelê de bi kar anîye, dibe ku întîhal were bîra mirovan. Lêbelê ger ev mexles tunebûya me yê bi awayekî teqez nîkarîba bigota ev werger ya Pertew e. Ji vî alîyê ve jî bikaranîna vê mexlesê karê me hêsantir dike, ne ku diwartir. Di heyama Pertew de haya helbestkaran ji hev û ji întîhalê hebû. Fuzûlî şairekî gelekî bi nav û deng e û berhemên wî jî tê naskirin, ji bo helbestkaran jî zehmet e ku malê kesekî meşhûr bidize û li ser navê xwe belav bike. Ne pêkan e ku haya helbestkarên din ji dizîyeke weha çê nebe û vê yekê bi rêya tezkîre û helbestan neynin ziman. Ger ev yek weke dizî bihata qebûlkirin dê ji alîyê helbestkar û tezkîrenûsên heyamê û yên piştî wê heyamê ve bihata rexnekirin. Herçiqas di edebîyata Kurdî de em hêj rastî tezkîreyan nehatine jî, lêbelê em dizanin ku tezkîrenûsên biyanî derbarê nezma Kurdî de jî nîrxandinên xwe kirine (Bnr. Adak, 2015:79). Herweha heta niha tezkîre jî di nav de em di berhemên nivîskî de ne ji bo Namî ne ji ji bo Pertew rastî rexneyeke bi vî rengî nehatine. Lewra Pertew dikare xwedîtîyê li vê xezelê bike û mexlesa xwe li binê wê bi cî bike. Çunkî Pertew wergerê vê metna edebî ye û ev karê wergerê jî di çarçoveya edebîyata klasîk de weke tradîsyonekê tê dîtin. Pertew jî di çarçoveya vê tradîsyonê de kedek daye û ev xezel wergerandiye zimanê xwe. Mafê wî heye ku îmzeya xwe jî biavêje binê vê kedê.

3.3.3. Ji Alîyê Werger, Huner û Uslûbê ve Analîz û Berawirdkirina Herdu Xezelan

Werger ji ber ku bi ziman re rasterast tîkildar e û destekê dide pêşketina çand û zimên. Werger di her dewra mirovahîyê de bal kişandiye ser xwe û ji bo pêşketin û belavbûna çand û zanistê di her dewrê de hatiye bikaranîn.

Di zanista zimannasîyê de werger weha tê nasîn; Werger veguhestina metneke ji zimanekî bo zi-

manekî din e. Ji van zimanan û zaraveyan ve yek jê zimanê çavkanî û yê din jî zimanê di hedefê de ye. Werger di navbera zimanan de bi devkî an jî bi nivîskî dikare bê kirin. Bêjeya "werger" bi bêjeya "tercume" ya Erebi re hemwate ye, "wergêr" jî dîsa bi bêjeya "mutercîm" re hemmane ye. Destpêka wergerê digihêjê berîya zayînê û wergera ewil ya nivîskî jî di tabletên Sumerîyan de xuya dibin. Werger jî daxwaz û pêwistîya tesbîta peyman û nivîsên dînî yên di navbera civakan de pêk hatiye. Civakên dîrokî xwestine peyman û metnên wan yên dînî di zimanên din de jî bîn dîtin. (Gündoğdu, 2004:93-101; Sucu, 2006:125-148; Bıçkıcı, 2016:373-383).

Li gor Joh Dreyden (1631-1700) hin cûreyên *rêbazên* wergerê hene ew jî ev in; *wergera bêje bi bêje* (moda mod), *wergera serbest û wergera teqlîdî*. Dîsa li gor Dreyden werger hunereke bi *îdia*, hesas û dijwar e. Divê wergêr hakimê her du zimanan be. Li gorî Dreyden xala girîng ya serkeftina wergerekê ew e ku wergêr û nivîskarê wê nivîsê divê di mijara afirandinê de di heman astê de bin û divê bikaribe karaktera nivîskar bide xuyakirin (Kızılhan, 2001:37-68).

Rifat Arya jî dijwarîya wergerê û bi taybetî jî dijwarîya wergera helbesta bi serwa tîne ziman û derbarê wergerê de weha dibêje:

"Rewşeke nazik e ku *hûn hem* bikaribin metna orjînal biparêzin û hem jî hêza vegotîneke estetîk û hunerî ya zimanê xwe bi kar binin. Serêşîya wergerê ya esas, ji nav van her du pirsgerêkan diçe der. Ev serêşî bêtir di wergera helbestê de, bi taybetî di helbesta bi qafîye de çêdibe. Wergêr mecbûr e qafîyeyê biparêze, dengên ku di zimanê wergerandî de saz dibin, divê bi qasî yên zimanê orjînal helbestane, nerm û herikbar bin. Gelo rewşa kesekî/e ku helbesta bi qafîye werdigerîne, hinekî naşibe ya wî dims-firoşî ku di her destekî wî de eyarek dims heye û divê bêyî ku yekî ji wan deyne, hem devê wan girêde û hem jî nerijîne! Ez dibêjim rewşa wergêr ne bi qasî ya dims-firoş talûke be jî gelek zehmet e û bê guman pisporîya temam dixwaze. Eger bête qebûlîkirin ku werger jî hunerek e, wê çaxê divê bête zanîn ku gelek girêk û pirsgerêkên wê, gelek kul û kurrederên *îcrakirina* wê jî hene. Lê wergerek ku qet nebe, divê ji bo destpêkê ji gelek pîvanên wê haydar be û hewl bide ku eslê metnekê dema tê bihîstin bandorekê dike, divê li ser xwendevanê zimanê wergerandî jî heman bandorê bihêle" (Arya, 2003:35-37).

Wergera ji zimanekî bona zimanekî din bi serê xwe hunereke payebilind e. Wergereke payebilind ji nivîsîna helbest, çîrok, romanê ne kêmtir e. Ew kesê/a ku nivîsekê werdigerîne, divê di hunera wergerê de xwedî têgihîştîneke bilind û hakimê herdu zimanan be. Ger wergêr di vî karî de ne şareza be dê serkeftinê jî bi dest nexe.

Di çarçoveya van zanyarîyan de wergera Pertew, tişteki din jî bi me dide zanîn. Ew jî ev e ku Pertew ne tenê bi Kurdî, bi zimanên biyanî jî zanibûye. Ji ber ku ev werger ji zimanê Tirkî bo Kurmancî hatiye kirin, em hîn dibin ku Pertew bi zimanê Tirkî jî zanibûye. Ev xezela ku Pertew wergera wê bo Kurmancî kiriye ne werger tenê ye. Her weha ev afirandîneke jinûve ye, lewra zimanekî din e û wergereke gelekî serkeftî û payebilind e. Çunkî nivîsa wergera wê hatiye kirin ne nivîsekê ji rêzê ye û ne cureyek ji pexşanê ye. Ev xezelek e ango cureyek ji helbesta klasîk e û wergera helbestan jî ne karekî hêsan e. Werger; huner, şarezayî, zanebûn û kedêke mezin jê re divê. Karê wergera hunerane tecrûbeyê dixwaze. Divê wergêr di her du zimanan de jî şareza be û amûrên helbestê yên weke kêş, serwa, paşserwa, melodî û herweha maneya bêjeyî û hevokî jî baş bizanibe.

Zimanê Pertew xweş tê fêhm kirin, uslûba wî jî xwerû û hunerane ye, lê ev xezel li gorî helbestên wî yên din ne xwerû ye, ji bo zimanê roja me jî hinekî giran tê û di nav vê helbestê de gotinên Erebi û Farisî zêde ne, lê li gorî heyama wî û kevneşopîyê jî ev yek asayî ye. Herweha ev ziman di ya Tirkî de jî heman e. Pertew ev xezel mîna ya resen (ya Azerî) bi serwa, paşserwa û kêşa erûzê wergerandiye Kurdî. Serwa, paşserwa û qalibê kêşa wergerê û ya resen jî mîna hev in û ev mînakek ji wergera edebî ye. Bi kurtasî Pertew ev xezel bi şarezayîyekê ji Tirkî wergerandiye ser Kurdîya Kurmancî. Di xezela Kurdî de me bala xwe da uslûb û zimanê wergera Pertew û me tê de ev taybetî tesbît kirin:

Taybetîyên devoka Hekkarî/Behdînan tede xuya ne, hin bêje jî taybetîyên vê devokê di xwe de dihewîne û herweha hin lêker jî li gorî devoka Hekkarî-Behdînan hatine kişandin: Lêkera "nebit" li gor vê devokê ye (Nebit = Nebe, mi = mîn, ji xeyrî = ji xeynî/ji bilî, qe=qet, çu/çi=tu/ti). Ev hevok jî yek ji taybetîyên devoka Hekkarî/Behdînan e "... mi sultan her nebit ya Reb". Yanî ji min re Sultan ne lazim e. Weke tê dîtin ev hevok jî rengê vê devokê li ber çavan radixîne.

Wek ku di piraniya helbestên klasîk de heye di vê xezelê de jî peyvên ji Erebi û Farisî hene. Weke mînak: Mecrûh, 'afiyet, tehsîl, 'edl, ebrû, peykan û sultan... Hin bikaranînên gramatik yên Farisî jî di xezelê de xuya dibin, weke van daçekan: "der xatir", "ez 'afiyet". Di vê xezelê de ji gihanekan bi piranî gihaneka «û» hatiye bikaranîn. Hin gihanekên din jî ev in: Eger/gerçî, meger. Di cîyekî de jî "ku" heye.

Mezmûnên edebîyata klasîk yên hevpar hatine bikaranîn. Di taswîrkirina yarê de ev mezmûn hatine bikaranîn: "but, kafîr, dilber, sultan" Hin mezmûnên din jî ev in: "kevan, qews, ebrû, xemz, peykan, meykede, wêran" û hwd.

Ji bo ku kêş pêk bê di hin bêjeyan de guhertin (xistina tîp û kiteyan ango kurtkirina bêjeyan û hwd.) pêk anîye û di hinan de jî qertafên veqetandekê bi kar neanîye. Weke: "qe=qet", "mi = mîn", bêçaran=bêçareyan, "dil mi = dilê min".

Di ya Kurmancî de ev lêker hene; Ne-b-it (awayê neyînî), bû-m, pê girt, kir û e (lêkera bûnê). Di ya Azerî de jî ev lêker hene; Ol-ma-sun (awayê neyînî), çek-tüğ/k-üm, bu-dur, çık-ar-mak, çek-üp, çık-an, ol-sun, ol-ur, bul-di.

Di xezelê de hin cûreyên ciwankariyê jî pêk hatiye: Ji bo mînandin/şibandîna (teşbîh); Helbestkar yara xwe geh şibandiye "kafîr, pût û zilmdaran" geh jî şibandiye "siltanan". Bi bêjeyên "but, kafîr, musulman û Reb" ciwankariya peyvên têkildar / pêwendarî (tenasub) pêk hatiye û ev bêjeyên têkildar di malîkekê de û bi hev re hatine bikaranîn. Di bêjeyên "kafîr û musulman" de jî ji ber ku ji hêla maneyê ve ev bêje li dijî hev in, ciwankariya dijî/dijwateyî (tezad) derketiye holê. Bi "ya Reb"ê jî bangî (nîda) pêk hatiye, lewra bêjeya "ya"yê bêjeyêke beneşanî ye û di wateya bangkirin û gazîkirinê de hatiye bikaranîn.

Ev helbest, ji ber ku hemû taybetîyên xezelê di xwe de dihewîne, ji wê re "xezel" hatiye gotin. Ev xezel ji aliyê yekeya nezmê, şemaya serwayê, hejmara malîkan û mijarê ve ne xezelêk kême, ev hemû taybetî bi tevahî tê de hene. Ger di hemû malîkên manzûmeyekê de heman mijarê hebe û ew yekbûna mijarê bi aşkerekî di helbestê de were dîtin û hîskirin ji wê helbestê re helbesta "yek-aheng" û ji xezelê

re jî "xezela yek-aheng" tê gotin. Herweha ligel yekbûna mijarê hemû malikên helbestekê di heman hêz û xweşikahîyê de be ew jî dibe helbesta "yek-awaz" (Kurnaz & Çeltik, 2011:66; Saraç, 2013:49). Ji ber ku di nav malikên vê xezelê de yekîtiya mijarê heye dibe "xezela yekaheng" û herweha hemû malikên wê jî ji ber ku di heman hêz û xweşikahîyê de ne ji vî alî ve jî dibe "xezela yek-awaz".

Hin ji îzafet û bêjeyên hevpar ên edebîyata klasîk û herweha yên ku di vê xezelê de hatine bikaranîn li jêr hatine dayîn. Em di vê xezelê de dibînin ku di edebîyata klasîk de îfade û bêjeyên çanda hevpar jî gelek in. Gava em bala xwe didin vê wergera xezelê em dibînin ku Pertew li gorî kevneşopîya edebîyata klasîk tevgerîyaye û weke wergêr zêde midaxaleyî mezmûn û îfadeyên hevpar ên vê kevneşopîya edebîyatê nekiriye. Ji ber ku Pertew ji aliyê ruxsarî ve serwa, paşserwa û heman qalib bi kar anîye uslûba Fuzûlî jî parastîye û guhertinên mezin jî çê nebûne. Ev bêje û mezmûnên hevpar ên li jêr derbarê wergerê de jî fikrekê didin me. Ev bêje û îzafetên di her du xezelan de hene ev in:

zâr û perîşân = jar û perîşan; yâ Rab = ya Reb; Esîr-i derd-i = Esîr û derdidarê; dâg-i hicrân = dagê hicran; bütler = butan; kâfirler esîri = Esîrê kafiran; endîşeden = ji wê endîşe'ê; Cefâsina û cevrine = cewr û cefaya; dil-i mecrûh = dilê mecrûh; meyhâne küncinde = kuncê meykedê; Cefâ vü cevr ile mu'tâdem = mu'tadê cewr; müselmân = Misilman; endîşe-i katlümde = qetla, endîşe; derd = derd; peşimân = peşêman; vîrân = wêran; pâyân = payan; 'adli = 'edl; ğayrı = ğeyrî; tahtina = textê; sultân = sultan; peykân = peykan; 'âfiyet = 'afiyet...

Herweha ji hêla maneyên xwe ve jî em dikarin van bêjeyan mînak bidin; "Wekî min = Benüm tek (Benim gibi), Qet = Hiç. û Pertew jî bo "ol mâh" a Fuzûlî "ew dilber" bi kar anîye.

Encam

Ev xezela ku bi paşserwaya "Ya Reb" e û ji heft malikan pêk hatiye bi eslê xwe bi zaraveya Azerî û ji aliyê Fuzûlî ve hatiye nivîsîn û di dîwana Fuzûlî ya Tirkî de jî cî digire. Gava em qaîdeyên kevneşopîya edebîyata klasîk li ber ber çavan digirin; em vê xezela ku Pertew ew wergerandiye Kurdîya Kurmancî bi întîhalê nahesibînin. Lewra ev wergereke ji zimanekî dinê ye. Pertew jî ji bo hunermendîya xwe pêşkêş bike ev xezel bi awayekî xweş, bi uslûbeke hunerî wergerandiye ser Kurdîya Kurmancî. Ya ku Pertew li vir kiriye ne nezîre û şerha wê ya bi Kurdî ye, em dikarin bibêjin ev bûye wergereke serkeftî.

Di nusxeyên Tirkî de du malikan di nav xwe de cî guhertine. Ji ber ku nusxeya muellîf di destên me de tune ye, me çavkanîya vê guhertinê tesbît nekir. Herweha di wergera wê ya Kurdî de jî dîsa me dît ku cihê du malikên cuda di nav xwe de hatine guhertin. Dîsa ji ber ku yek nusxe di destê me de bû û ji ber nebûna nusxeya muellîf çavkanîya vê guhertinê jî me nekarî derbixista holê.

Herçiqas gava ku wergêr Pertew ev xezel wergerandiye Kurdîya Kurmancî û li şûna mexlesa "Fuzûlî" mexlesa xwe "Pertew" bi cî kiribe jî em vê yekê weke niyeteke xirab û întîhal nabînin. Herweha ev ne pexşanek e; lê helbestek bi kêş, serwa û bi paşserwa ye. Di edebîyata klasîk de jî tê dîtin ku werger weke kevneşopîyekê hatiye qebûl kirin û em vê yekê dîsa li ba Fehmî Begê Pêçarî jî dibînin ku wî jî xezeleke Fuzûlî wergerandiye Kurdî û paşê ew texmîs kiriye. Lêbelê wî jî mexlesa xwe ya "Namî" li şûna ya Fuzûlî bi kar anîye. Ev yek jî di Edebîyata Kurdî ya Klasîk de jî hebûna

vê kevneşopîyê piştrast dike. Ji ber ku daxwaza helbestkarên edebîyata klasîk herî zêde pêşkêşkirina huner, jêhatîbûn, pesindan û danberhevkirina zanebûnê bû; em jî vê wergerê wek întîhal nanirxînin û weke wergereke ku di çarçoveya kevneşopîyê de hatiye kirin, dibînin.

Ev xezel bi zelalî bandora Fuzûlî li ser Pertew dide xuyakirin. Jixwe gava hewla wergera berhe-meke kesekî/ê hebe, ew bi xwe ji bo bandorê dibe nîşaneyekê jî. Ger bandora berhemên Fuzûlî li ser Pertew çê nebûya û Pertew ev xezel neecibanda dê ew wernegeranda ser Kurmancî.

Pertew jî bi şarezayî li vir xwestiyê hunermendîya xwe bide nîşan û bibêje; va ye ez jî ne kêmfî Fuzûlî me, ez jî dikarim mîna Fuzûlî helbestan binivîsim û ez jî ji çend zimanan fêhm dikim û dizanim. Ji ber hindê meqseda Pertew jî vê helbestê ne întîhal e, belkî pesn û nîşandana şiyana xwe ya di nezmê de ye. Di wergera vê xezelê de ti kêmasî nayê xuyakirin û wergêr ji metnê re sadîq maye. Ev xezel jî bo têkilîya di navbera edebîyata Tirkî û Kurdî de nimûneyeke gelekî baş e.

Di vê xezela Pertew de bi gelemperî taybetîyên devoka Hekkarî-Behdînî xuya dibin. Tê de mez-mûnên edebîyata klasîk ên hevpar hatine bikaranîn. Wekî di piranîya helbestên klasîk de hene, di vê xezelê de jî peyvên biyanî hene û bikaranîna van peyvên di edebîyata klasîk de hevpar e û ev tiştekî asayî ye.

Ev xezelek tesewîfî û lîrîk e. Pertew ev xezel mîna ya resen (Azerî) wergerandiye Kurmancî; bi heman serwa, paşserwa û kêşa erûzê ve mîna ya resen wergerandiye.

Ev werger me ji tiştekî din jî agahdar dike, ew jî ev e ku Pertew di dema xwe de helbestkar û edebîyatên berîya dewra xwe yê gelên cîranan jî şopandiye û ji wan agahdar bûye. Em ji wergerê têdigihêjin ku Pertew bi zimanê Tirkî (devok an jî zaraveya Azerî) jî zanibûye.

Herweha ev helbest têkilîya di navbera edebiyata Tirkî û Kurdî de jî hinekî li ber çavan radixîne û em pê dizanin ku hinek berhemên Tirkî di mîrektiyên Kurd de jî tê dîtin ku yek ji wan jî dîwana Fuzûlî ye.

Çavkanî

- Adak, A. (2014). *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, (Çapa Duyem). Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Adak, A. (2015). Li Gorî Serdemên Tarîxî Têkilîyên di Navbera Edebiyatên Kurdî û Tirkî yê Nê Klasîk de. *Sempozyûma Edebiyata Berawirdî- Ji Duh Heta Îro di Edebiyatên Tirkî û Kurdî de Texeyulên Nasnameyî-*. Mêrdîn: Weşanên Mardîn Artukluyê, (r. 75-110).
- Akyüz, K., Beken, S., Yüksel, S. & Cunbur, M. (1958). *Fuzûlî Türkçe Divan*, Ankara: Türk Tarih Kurumu Basımevi.
- Alkan, A. T. (2010). Mimar Sinan'ın Ermeniliğine Dair. *Aksiyon Dergisi*. (Gihandina Dawî: 25.12.2015), <http://ahmetturanalkan.com/yazi/mimar-sinanin-ermeniligine-dair/>
- Amêdî, S. B. (1978). *Pertew Begê Hekarî Dîwan*. Komara Îraqê, Bexdad: Wezaretê Rewsenbîrî û Hunerê, Çapxaneyê Dar-ul Huriyetê.
- Amêdî, S. B. (1991). *Pertew Begê Hekarî Dîwan*. Zeynelabidîn Zinar (Wergerandina ji tîpên Ere-

bî). Tyskland/Bonn: Weşanên Rewşen.

Arya, R. (2003). **Çend** Gotin li ser Wergerê. *Kovara Kevan (Çapa Yekem)*. Stenbol: Weşanên sî (h. 6, r. 35-37).

Bıçkıcı, T. (2016). Çeviri Kuramı Işığında Edebi Çeviri Eleştirisi. *Akademik Sosyal Araştırmaları Dergisi*. (Yıl: 4, Sayı: 24, r. 373-383).

Cizîrî, M. (2013). *Dîwan*. (Çapa Sêyem). (Selman Dilovan Amd.). İstanbul: Weşanên Nûbihar.

Çelebî, E. (1965). *Evlîya Çelebî Seyahatnamesi* (cilt:3-4). İstanbul: Üçdal Neşriyat.

Demir, Y. (2019). *Dîwana Namî (Fehmî Begê Pêçarî): "Meğmuru 'd-Dewawîn" Metn û Lêkolîn*. Mêrdîn: Teza Lîsansa Bilind a **Çapnebûyî**, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, **Şaxa** Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.

Develioğlu, F. (2003). *Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat*. Ankara: Aydın Yayınları.

Durmuş, İ.(2000). İntihal. *İslam Ansiklopedisi*. (22. Cilt, r. 347-350). İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı.

Fuzûlî, *Dîwan* (Tirkîya Osmanî), Nusxeya Fotokopî ya Destxetê: <https://sufiworld.com/divan-i-fuzuli> (Gihandina Dawî: 05.02.2021)

Fuzûlî, *Dîwan û Beng û Bade* (Tirkîya Osmanî), Nusxeya Fotokopî ya Destxetê: <https://sufiworld.com/divan-i-fuzuli-kitab-i-beng-u-bade> (Gihandina Dawî: 05.02.2021)

Fuzûlî. (2014). *Fuzûlî Türkçe Divanı* (2. Baskı). İsmail Parlatır (Yayına hazırlayan). Ankara: Akçağ yayınları.

Gündoğdu, M. (2004). Çeviride Kuram-Uygulama İlikisi. *Uluslararası IV. Dil, Yazın ve Deyişbilim Sempozyumu Bildirileri*. Çanakkale: Çanakkale Onsekiz Mart Üniversitesi yay. (r. 93-101).

Hekkarî, P. B. (2006). *Dîwana Pertew Begê Hekkarî*. Tehsîn İbrahim Doskî (Amd.), (Bi herfên Ere-bî), Duhok: Weşanxana Spîrêz.

Hekkarî. P. B. (1945). *Dîwana Pertew Begê Hekkarî*, (Nusxeya Destxet a Kemal Badıllı).

Hekkarî. P. B. (2011). *Dîwana Pertew Begê Hekkarî* (Çapa yekem). Tehsîn İbrahim Doskî, (Amd.), (Latînzekirin: M. Xalid Sadîni-İhsan Guzereşi). İstanbul: Weşanên Nûbihar.

İlmî, M. E. (2012). *Dîwana Mela 'Elî 'İlmî (Zîla), Jıyan, Berhem û Helbestên Wî*. Necatê Zivingî (Amd.), İstanbul: Weşanên Banga Heq, 2012.

İpekten, H. (2013). *Fuzûlî Hayatı Sanatı ve Eserleri*, (10. Baskı). Ankara: Akçağ yayınları, 2013.

Kanar, M. (2015). *Fuzûlî Dîvanı* (1. Baskı). İstanbul: Ayrıntı Yayınları.

Kaplan, H. (2017). Divan Edebiyatında İntihal: Alıntı mı Çalıntı mı?, *Akademik Sosyal Araştırmalar Dergisi*. (Yıl: 5, Sayı: 40, r. 39-98).

Kaplan, Ü. (2007). *Divan Şiirinde Tasavvuf*, Ankara, Birleşik Yayınları.

Karahan, A. (1989). *Fuzûlî Muhiti, Hayatı ve Şahsiyeti*. (İkinci Baskı). Ankara: T.C. Kültür Bakanlığı Yayınları, Başbakanlık Basımevi.

Karataş, T. (2005). 'İntihal' Terimi Etrafında Bazı Tesbitler. *Hece Dergisi*. Ankara: (hej. 107, r. 65-68).

Keyfî, "Gazel", *Tercüman-i Hakikat Gazetesi*, no: 969, r. 2, 18 Şevval 1298 (13ê îlona 1881ê).

Keyfî, "Cevabnamî Manzûm", *Tercüman-i Hakikat Gazetesi*, no 974, r. 3, 25 Şevval 1298 (19ê ilona 1881ê).

Kızıllhan, R. (2001). Tarihte Çeviri. *Ankara Üniversitesi Dil ve Tarih-Coğrafya Fakültesi Dergisi*, Ankara: (41, 1, r. 37-68).

Köksal, M. F. (2018). *Sana Benzer Güzel Olmaz Divan Şiirinde Nazire*. İstanbul Büyüyen Ay yayınları.

Kudret, C. (1985). *Divan Şiirinde Üç Büyükler-I Fuzuli*, İstanbul: İnkilap Kitapevi.

Kurdî, M.B. (2010), *Dîwana Kurdî*, Mihemed Mistefa Hemebor (Amd), Hewlêr: Weşanxaneyaya Aras.

Kurdo, Q. (1992). *Tarîxa Edebyeta Kurdi*. Ankara: Özge Yayınları.

Kurnaz, C. & Çeltik H. (2011). *Divan Şiiri Şekil Bilgisi*, İstanbul: H Yayınları.

Macit, M., Ceylan Ö. & Yılmaz, O. (2015). *Klasik Dönem Osmanlı Nazmı*. İstanbul: Kesit yayınları.

Mengi, M. (2016). *Eski Türk Edebiyatı Tarihi*. (23. Baskı). Ankara: Akçağ yayınları.

Mevlevî, T. (1994). *Edebiyat Lügati*. İstanbul: Enderun Kitabevi.

Mewlewî, A. (1966), *Dîwana Mewlewî*, Mela Ebdulkerîm Muderîz (Amd), Senendec: Weşanxaneyaya Kurdistan.

Nebez, J. (2013). Wergerandin Huner e. *Kovara W*. (h. 45, Rêbendan-Reşemî).

Özgül, M. K. (2005). İntihâlden Çalıntıya, İntikalden Alıntıya. *Hece Dergisi*. Ankara: (hej.7, r. 52-64).

Pala, İ. (2007). *Ansiklopedik Divân Şiiri Sözlüğü*. (15. Baskı). İstanbul: Kapı Yayınları.

Rûhanî, B.M. (2017). *Kürt Meşhurları Tarihi*, Hüseyin Siyabend (Edt). İstanbul: Hivda Yayınları.

Sağmıç, F. H. (2002). *Dîroka Wêjeya Kurdî*. Stenbolê: Enstîtuya Kurdî ya Stenbol.

Saraç, A.E. (2018). *Fuzulî'nin Farsça ve Türkçe Gazellerinin Aruz ve Kaftiye Bakımından İncelenmesi* (Basılmamış Yüksek Lisans Tezi). İstanbul: İstanbul Medeniyet Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı.

Saraç, Y. (2013). *Klâsik Edebiyat Bilgisi; Belagat*, İstanbul: Gökkuşbu Yayınları.

Sucu, N. (2006). Eski Türk Edebiyatında Tercüme Geleneği. *Türkiyat Araştırmaları Dergisi*. (r. 125-148).

Tarlan, N. (2013). *Fuzulî Divanı Şerhi* (7. Baskı). Ankara: Akçağ yayınları.

Tek, A. (2018). *Hâmisiz Şâir Babasız Metin Mem û Zîn ve Osmanlıca Çevirileri Üzerine Bir İnceleme*. İstanbul: Nûbihar Yayınları.

Temo, S. (2016). Fuzulî'nin Kürtçe Şiirleri. *Gazete Duvar*. <http://www.gazeteduvar.com.tr/ki-tap/2016/12/01/fuzulinin-kurtce-siirleri/> (Gihandina dawî: 20.01.2017).

Tosun, N. (2005). Yazar Taklidi. *Hece Dergisi*. Ankara: (hej. 107, r. 86-90).

Türk Dili ve Edebiyatı Ansiklopedisi. (1981). İstanbul: Dergâh Yayınları, (cilt: 4).


Veroj, S. (2014). Ji Dîwana Fuzulî Ber Bi Nasnameya Wî Ve. *Kürt Tarihi*, İstanbul. (hej.12 r. 44-49).

Veroj, S. (2017). *Abdurehman Nacîm –Edîb, Şaîr, Perwerdekar, Hiqûqnas-*. Stenbol: İsmail, Beşikçi Vakfı Yayınları.


Yûsif, E. (2012). *Dîwana Kurmancî Şairên Klasîk ên Kurd*. (Latînezekirin: Ziya Avcı), Stenbol: Weşanên Diwan.

Yüksel, M. S. (1972). Sohbetü'l-Esmar Fuzûlî'nin Değildir. *Türkoloji Dergisi*, (Cilt: 4, Sayı:1, r. 115-136).


Pêvek-I: Destxeta xezela Fuzûlî ya “Ya Reb”ê. (Nusxe: Qudbeddîn el Kirmanî, r. 37-38)




Pêvek-II: Destxeta xezela Fuzûlî ya “Ya Reb”ê, (Nusxe: Mustensîx Nediya, r. 18-19).




Pêvek-III: Destxeta xezela Fuzûlî ya “Ya Reb”ê, (İpekten, 2013:253).




Pêvek-IV: Destxeta xezela Fuzûli ya "Ya Reb"ê. (Macit, Ceylan & Yılmaz, 2015:226).




Pêvek-V: Destxeta Xezela Pertew ya "Ya Reb"ê, (Nusxe: Kemal Badilli)



Pêvek-VI: Xezela Pertew ya "Ya Reb"ê, (Amêdî, 1978).



Pêvek-VII: Xezela Pertew ya "Ya Reb"ê, (Hekkarî, 2006:131).



Cengiz, E. (2021). Siirt Arapçasında Kullanılan Atasözleri ve Deyimlerde Dini Motifler, The Journal of Mesopotamian Studies, 6 (1), 129-143 DOI: 10.35859/jms.2021.829321.

MAKALE BİLGİSİ/ARTICLE INFO

Article Type/Makale Türü: Research Article /
Araştırma Makalesi
Received / Makale Geliş Tarihi: 03.03.2021
Accepted / Makale Kabul Tarihi: 19.03.2021
Doi: 10.35859/jms.2021.829321

SIİRT ARAPÇASINDA KULLANILAN ATASÖZLERİ VE DEYİMLERDE DİNİ MOTİFLER*

Emin CENGİZ

Dr. Öğr. Üyesi, Şırnak Üniversitesi, İlahiyat
Fakültesi, Arap Dili ve Belagatı Anabilim Dalı
/ Assistant Professor Dr., Şırnak University,
Faculty of Divinity, Department of Arabic
Language and Rhetoric, fatih-emin@hotmail.
com, <https://orcid.org/0000-0001-5109-1342>

Özet

Dil ile kültür arasında sıkı bir ilişki vardır. Zira her toplum tarih ve kültürünü kendi dilinde yaşatır ve gelecek kuşaklara aktarır. Tarihi süreç içerisinde geniş bir toplumsal mutabakatla oluşup bütünlüğünü büyük oranda koruyan atasözleri de dil sisteminin en işlek unsurlarındandır. Nitekim atasözleri arkeolojik araştırmalarda elde edilen bulgular gibi bir toplumun dini, tarihi ve kültürü hakkında son derece önemli bilgiler sunar. Bir toplumun dini yapısı o toplumun başta dili olmak üzere kültürünü, düşünce yapısını, dünya görüşünü ve yaşam tarzını etkileyen önemli bir faktördür. Aynı şekilde bir toplumun dili, başta din

* Bu çalışma, 10-12 Haziran 2019 tarihinde İKSAD tarafından Siirt'te düzenlenen ISPEC Uluslararası Sosyal ve Beşeri Bilimler Kongresi'nde yazar tarafından sunulan "Siirt Arapça Dialektinde Kullanılan Atasözlerinde Dini Motifler" adlı bildirinin genişletilerek makaleye dönüştürülmüş halidir.